



TÊKOŞER



HEJMAR 36

HEZİRAN 1987



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

TEKOŞER: KOVARA TEKOŞER, YEKİTIYA KARKER Û XWENDEKAREN KURD LI BELÇIKA

NAVNIŞAN: rue BONNEELS, 4 - 1030 BRUXELLES - BELGIQUE

TEL: 02/230.89.30

NAVNIŞANA POSTE: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

BUHA: 50 F.B.

N° BANKE: 426-3144071-85 - K.B. - BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezh YALÇIN

KOMITA NIVİSKARIYÊ: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

N A V E R O K

CIVINEK LI SER XARİTA KURDISTANE	Derwêş	R. 3
PIRSA KURDÎ LI PARLAMANA EWRUPA		R. 4
NIJADKUJIYEKE NUH LI KURDISTANA IRAQÊ		R. 6
RÊZIMANA KURDÎ (IX), BILINDEKA XURT ...	Celadet BEDİR XAN û Roger LESCOT	R.10
HELBESTEN XWENDEVANAN	Ahmed, Beşîr BOTANÎ, Sebrî BOTANÎ ...	R.16
ROMAN Û KURTEÇİROK	TORÎ	R.18
DİROKA KURDISTANE DI ANSİKLOPEDIYA ISLAME DE (IX), LI IRAQ, SÛRIYE Û LUBNANÊ ..		R.20
DESTANA SIYABEND Û XECE Û ÇAPA BIYANÎ	Amed	R.26
HUNERMENDÊN KURD: BRİNDAR	Derwêş	R.32
D. İZOLÎ: FERHENG A KURDÎ-TIRKÎ	Derwêş	R.34
ÇEND WENE JI NEWROZA 1987		R.36
XEBATA ME		R.38

S O M M A I R E

UNE SEMAINE D'ETUDE SUR LA CARTE GEORGRAPHIQUE DU KURDISTAN	Derwêş ...	P. 3
LA QUESTION KURDE AU PARLEMENT EUROPEEN		P. 4
NOUVEAU GENOCIDE AU KURDISTAN D'IRAQ		P. 6
GRAMMAIRE KURDE (IX), ACCENT TONIQUE ...	Celadet BEDİR XAN et Roger LESCOT	P.10
POEMES DES LECTEURS	Ahmed, Beşîr BOTANÎ, Sebrî BOTANÎ	P.16
LE ROMAN ET LA NOUVELLE	TORÎ	P.18
L'HISTOIRE DU KURDISTAN DANS L'ENCYCLOPEDIE DE L'ISLAM (IX), IRAQ, SYRIE, LIBAN		P.20
L'EPOPEE DE SIYABEND ET XECE ECRITE PAR DES ETRANGERS	Amed	R.26
LES ARTISTES KURDES: BRİNDAR	Derwêş	P.32
D. İZOLÎ: DICTIONNAIRE KURDE-TURC	Derwêş	P.34
QUELQUES PHOTOS DU NOUVEL AN KURDE "NEWROZ" DE 1987		p.36
NOS ACTIVITES TRIMESTRIELLES		P.38

I N H O U D

STUDIEWEEK OVER DE KOERDISCHE LANDKAART,	Derwêş	P. 3
HET KOERDISCHE VRAAGSTUK IN HET EUROPEES PARLEMENT		P. 4
NIEUWE MASSAMOORDEN IN IRAAKS-KOERDISTAN		P. 6
KOERDISCHE GRAMMATICA (IX),STERKE KLEMTONEN ..	Celadet BEDIRXAN & Roger LESCOT.	P.10
GEDICHTEN VAN DE LEZERS ...	Ahmed, Beşîr BOTANÎ, Sebrî BOTANÎ	P.16
ROMANS EN KORTE VERHALEN	TORÎ	P.18
GESCHIEDENIS VAN KOERDISTAN IN DE ISLAMITISCHE ENCYCLOPEDIE (IX)		P.20
EPISCH VERHAAL VAN SIYABEND EN XECE GESCHREVEN DOOR BUITENLANDERS ...	Amed ...	P.26
KOERDISCHE KUNSTENAARS: BRİNDAR	Derwêş	P.32
D. İZOLÎ: KOERDISCH - TURKS WOORDENBOEK	Derwêş	P.34
ENKELE PHOTOS VAN HET NEWROZ-FEEST 1987		P.36
ONZE AKTIVITEITEN		P.38

CIVÎNEK LI SER XARÎTA KURDISTANÊ

Derwêş

Ji 19 ta 25ê Nîsanê, di bin berpirsiyariya Enstituya Kurdî ya Parîsê de civînek bi zimanzan, nivîskar, rojnamevan û nûnerên kovarên Kurdî re pêk hat. Vê civînê heşt rojan dewam kir. Di van heşt rojan de xebateke giranbiha hat kirin.

Cara yekem e ku bingeha xebateke weha giring bi awakî akademîk bi zaravê Kurmancî hat danîn.

Di vê civîna ku li Barcelona, paytextê Katalonya otonom li Spanya cî girt, xebata amadekirina xarîteke Kurdistanê û a cîhanê bi zimanê Kurdî bû. Coxrafya Kurdistanê, nivîsîna navên bajarên Kurdî, coxrafya welatên cîran û yên Awrûpa, Asya, Afrîka, Awustralya, Amerîka yek bi yek, bi agadariyeke mezin hatin nivîsîn. Hemî bajarên Kurdistanê û yên welatên cîran bi navên Kurdî dikevin ser xarîtê. Lê yên din, ewê weka xwe bînan danîn, lê di bin wan de bilêvkirina wan a Kurdî ewê bê nivîsîn. Bi vî awayî, cara yekem e di dîroka Kurdistanê de ku amadekirina xarîteke Kurdî bi tîpên latîni tê avêtin û weşandin. Ewê xarîte bixwe di nav van mehên ber me de bê weşandin û belav kirin.

Di civînê de herweha li ser rastnivîsîna navên demên salê, navên mehan, (he)jmaran jî hate kirin.

Navên teşkilatên navnetewî û hwd. hatin nivîsîn.

Dema ku xarîta me bi zimanê me derkeve em êdî naçin li xarîtên ku bi zimanên din hatine nivîsîn nanêrin. Ew jî serbilindiyeke ku em bêjin "binêr xarîta me bi zimanê me".

Paş derketina xarîtê, di demeke musait de ewê li ser amadekirina atlasê bê kar kirin. Xebat bi vî awayî berdewam dike.


Hêdî hêdî em xwe ji bin tesîra "kultûra"

welatên cîran derdixin, ji ya xwe re xwedî derdikevin. Bê gûman ev xebat û karê ku amade bibe ji gel re, ji xwendevanan, ronakbîr û hwd. tê pêşkêş kirin. Xebatkarên van civînan li benda bersivên wan dimînin. Ger gel van navan û tiştan bi awakî xweş qebûl bike, wan bi kar bîne, êdî ew biryar cihên xwe digrin û ev xebat ewê pêşdetir biçe. Lê ger ew hin tiştan, hin navan bi kar neyênin û navên din bi kar bînin biryar tên guhertin û xebat bi awakî din dimeşe. Em karin weke nîşe, navên mehan bidin. Di civîna Barcelona de navên mehan weha hatin pêşneyar kirin: çile, sebat (sibat), adar, nîsan, gulan, hezîran, tîrmeh, tebax, îlon, çirî, teşrîn û kanûn. Li hin cih û kovaran hin ji navên van mehan bi awakî din tînan bi kar anîn. Nîşe, di cihê çirî û teşrînê de cotmeh û mijdar tînan bi kar anîn. Gelo kîjan tînan bi kar anîn û dimînin? Gel biryar dide. Ji ber ku her du alî jî li hin cihan tînan nasîn lê li hin cihên din nayên nasîn.

Kesên ku di civînê de beşdar bûn xebateke kûr û giring li ser zimanê Kurdî dikin. Ferhad Şakelî, Reşo Zilan, Rojen Barnas û sermîyanê Enstituya Kurdî li Parîsê Kendal, di nav vê xebata zimanê Kurdî de ne. Bi tecrûbên zimannasiya wan û zengîniya zimanê Kurdî yê gel ku rojnamevan û nivîskarê hêja Mahmut Baksî û Xosro pê xurt bûn di vê civînê de heşt rojan xebateke hêja hat kirin.

Lê ji bîr mekin ku ne bes e. Ev destpêk e. Bê gûman, di civînên pêş me de emê tiştên nuh, pêşneyarên din bibihîzin. Hêviya me Kurdan ew e ku ev xebata hêja bi ser keve.

Erkê me Kurdan jî alîkariya vê xebata giranbuha ye.



PÎRSA KURDÎ LÎ PARLAMANA EWURUPA

Di mêjuya (tarîx) 29.1.1987 de, her du parlamanterên belçîkî, J. VANDEMEULEBROUCKE û W. KUIYPERS, pêşneyarekê li ser pîrsa kurdî da Parlamana Ewropa. Em metnê wê weka xwe, bi zimanê fransîzî, diweşînin:

FR



Communautés Européennes

PARLEMENT EUROPÉEN

DOCUMENTS DE SEANCE

Edition en langue française

1986-87

29 janvier 1987

SERIE B

DOCUMENT B2-1508/86

PROPOSITION DE RESOLUTION

présentée par MM. VANDEMEULEBROUCKE et KUIYPERS

conformément à l'article 47 du règlement

sur les conséquences de la guerre entre l'Irak et l'Iran pour la région de Mossoul et de Kirkûk et, en général, sur la répression turque à l'égard de la population kurde des régions turques avoisinantes

Le Parlement européen,

- A. considérant que le conflit irako-iranien évolue en faveur de l'Iran,
 - B. considérant que cette situation donne à la République turque l'occasion de réaliser un certain nombre de projets relatifs à la région irakienne de Mossoul et de Kirkûk,
 - C. rappelant que la Turquie rêve de s'emparer, prétendument pour la protéger contre une attaque iranienne, de cette région pétrolifère dont l'Irak extrait les deux tiers de son pétrole, qu'il achemine par oléoduc à travers une partie du territoire kurde (sud-ouest et nord-ouest du Kurdistan) vers le complexe portuaire d'Adana-Yumurtalik,
 - D. considérant que certains milieux turcs ont récemment proclamé à plusieurs reprises que la région de Mossoul et de Kirkûk (qui fait partie, en fait, du Kurdistan méridional) appartient à la République turque, qui ne l'a perdue qu'à la suite d'une "injustice de l'histoire",
 - E. considérant que les mêmes milieux déclarent à présent que le moment est venu de réparer cette "injustice historique",
 - F. considérant qu'un certain nombre d'observateurs affirment catégoriquement que les Etats-Unis ont l'intention arrêtée de contenir l'Iran et entendent utiliser la Turquie à cet effet,
 - G. considérant que cela permettrait également à la Turquie d'intervenir contre les combattants indépendantistes kurdes, pour qui cette région constitue en quelque sorte la base arrière,
 - H. considérant que les mouvements de libération du nord-ouest du Kurdistan parviennent régulièrement à porter des coups sérieux à la République turque,
 - I. rappelant les témoignages antérieurs relatifs à la terreur turque dans les territoires kurdes,
 - J. rappelant notamment que, dans la province de Mardin, les habitants kurdes sont brimés de toutes les façons possibles : interdiction de semer à l'époque des semailles entraînant la misère, arrestations arbitraires et tortures, intimidations et contrôles incessants, etc., par représailles pour les activités des mouvements de libération,
1. condamne sans réserve toute invasion éventuelle de la région de Mossoul et de Kirkûk par la Turquie ;
 2. demande aux Etats-Unis de ne favoriser ou de n'approuver en aucun cas semblable invasion ;
 3. invite les ministres des Affaires étrangères se réunissant dans le cadre de la coopération politique à s'opposer énergiquement à l'occupation de la région précitée par la Turquie ;
 4. invite également les ministres des Affaires étrangères à protester auprès des autorités turques contre les violations répétées des droits de l'homme dont est victime la population civile des régions kurdes ;
 5. charge son Président de transmettre la présente résolution aux ministres des Affaires étrangères se réunissant dans le cadre de la coopération politique, ainsi qu'aux gouvernements turc et américain.

NIJADKUJIYEKE NUH LI KURDISTANA IRAQÊ

Cardin leşkerê Iraqê dest bi nijadkujiyeke (qetliam) mezin li Kurdistana Iraqê kir. Li ser vê yekê, P.D.K.I. namekê ji rêxistinên navnetewî re şand. Em li jêr metnê wê weka xwe, bi ingilîzî, diwêşînin:

U R G E N T A P P E A L

To/

Secretary General - UN,
Leaders and Heads of Friendly Countries,
Human Rights Activists,
International Red Cross,
Amnesty International,
International Human Rights Association,
World Health Organisation,
UNESCO,
UNICEF,

Dear Sirs,

Kurdistan in Iraq is once again being subjected to a campaign of total destruction and a war of genocide targeted against innocent civilians in Kurdish towns and villages. The areas affected include SOLAYMANIA, KARKOUK, ARBIL and DOHOK governorates as well as other Kurdish towns administratively affiliated to the governorates of NENEVA, DIALA and SALAHADDIN.

Following is a detailed account of the tragedy of the Kurdish people and the atrocities committed against them by the present government of Iraq.

1. Since mid April the Iraqi authorities have been enforcing a fullscale deportation campaign to remove the majority of Kurdish villages surrounding Kurdish towns and governorates. These measures have so far covered a number of administrative centres including the town of SANGAO and nearby villages, which were evacuated by force on 22th April. Also evacuated, at the same time, was the town of AAGHJALAR and the surrounding villages. Many villages were leveled to the ground and their inhabitants evicted and placed in concentration camps, other villages had no alternatives but the streets. Details of the villages affected have already been sent abroad through our representatives.
2. In order to terrorise Kurdish villagers and force them to leave, the Iraqi government has been using chemical weapons. On 15th - 16th April, for instance, 20 villages in the SOLAYMANIA and ARBIL governorates were hit with these weapons. Later these weapons, were used in bombarding a number of villages in the provinces of KARADAGH, MAWAT and nearby areas killing dozens of children, women and elderly people as well as seriously wounding more than 300 people. Names of 33 children, women and elderly people from the village of SHEKH WASSAN in SHAKLAWA, Arbil, were sent abroad through our representative. They all died on 16th April as a result of chemical bombardment of their village. Names of 30 wounded from the same village, were also sent abroad.

3. As a result of these acts and deportation measures, often backed by aerial bombardment and land assaults by the Iraqi forces, thousands of families have fled their towns and villages and sought refuge in the liberated areas controlled by our party's partisans and other opposition forces. In DOHOK governorate, alone, 5,500 families fled the concentration camp in KANE, a few kilometers east of AMADIA. As a result of homelessness and aerial bombardment, these families suffer from serious health problems and poor living conditions and accommodation. Their misery, however, does not end here, for they face extermination and starvation too, as a result of the economic blockade imposed by the Iraqi authorities. These families are looking for help and desperately need your kind and humane assistance and solidarity. On their behalf we call upon you to intervene and persuade the Iraqi authorities to halt these barbaric measures. On the other hand, half a million Kurds are living under equally bad, if not worse, conditions, following their eviction, they have been forced to live in concentration camps. Young and elderly Kurds are arrested indiscriminately and despatched to the battle to fight the destructive war which Iraq waged against Iran in September 1980.
4. The present episode of the eviction and deportation campaign is part of the long established policy of the Iraqi government which dates back to early 1970s. Deportation measures reached their peak during 1975 - 1978. Hundreds of Kurdish villages on an area of approximately 16,000 sq. Kms along the borders with Turkey and Iran were demolished. That particular campaign was backed by an equally vicious campaign of terror, extermination and the deportation of half a million Kurds to the deserts of central and southern Iraq. Since then deportation and demolition measures have been routinely carried out by the Iraqi authorities on daily basis. The current campaign, however, is the biggest ever. Indeed, Iraqi officials have designated 1987 as the year of total extermination of Kurdish opposition fighters, i.e. the extermination of tens of thousands of Kurds living in the liberated areas. To do this the Iraqi authorities, as seen from events, are determined to use every possible means to alter the national, historical and geographical identity of Kurdistan, even the use of the internationally banned chemical weapons, starvation or through forcing Kurds to fight the regime's war, a war which our people have always refused to fight.
5. The Iraqi government state, for local consumption, that their fullscale deportation and demolition campaign is merely a repercussion of the Iraq-Iran war. This however, is not the case for two simple reasons:
 - a) Chronologically, deportation measures and attempts to change the national character of Kurdistan begun ten years prior to the war. In fact the first deportation campaign dates back to as early as 1963.
 - b) Geographically, deportation measures have hit areas as far from the battlefield as SUMMAIL and ZAKHO near the Syrian border, as well as areas in DOHOK, ARBIL and SOLAYMANIA, 50-190 Km from the war front.
6. Extermination of civilians, use of chemical weapons, deportation of Kurdish villages, starvation, forced unemployment and exposing the Kurds to the peril of slow death, all these acts come under the term "mass extermination" as defined in the Geneva convention which calls for the punishment

of perpetrators of such crimes. The actions of the Iraqi government, particularly the extermination of national and ethnic groups and the creation of special living conditions which may lead to total or partial liquidation, constitute a flagrant violation of articles (3) and (4) of the Geneva convention. These acts are also in breach of the UN convention and the codes of other international humanitarian organisations. They are directed against the existence of an entire nation in Iraqi Kurdistan.

To underline the gravity and magnitude of these acts, we list below some statistics about the areas hit by deportation measures at the hands of the Iraqi authorities:

a) Areas where villages were evacuated and demolished

COMPLETELY:

Solaymania governorate	3546	sq. Kms
Arbil governorate	2899	sq. Kms
Karkouk governorate	3083	sq. Kms
Dohok governorate	4122	sq. Kms

T O T A L 13650 sq. Kms

This is in addition to areas previously evacuated.

b) Areas where 50% of villages have been evacuated and demolished:

Solaymania governorate	2684	sq. Kms
Arbil governorate	4349	sq. Kms
Salahaddin governorate/ Kader-Karam province	1450	sq. Kms
Dohok & Neneva governorate	1304	sq. Kms

T O T A L 9787 sq. Kms

c) Areas served with deportation orders:

Arbil governorate	4560	sq. Kms
Diala governorate/ Kufri province	2200	sq. Kms

In addition to the rest of towns and villages in SOLAYMANIA and DOHOK governorates.

In short, the Iraqi authorities are attempting at the moment to clear all Kurdish villages of their inhabitants. Against this background we appeal to you on behalf of our oppressed people, thousands of homeless or detained families in towns and concentration camps, Kurdish children who are constantly exposed to the perils of starvation, fear and physical extermination, mothers, deprived peasants and students, on behalf of all our people we appeal to you to:

firstly,

declare your solidarity with our people in their predicament.

secondly,

intervene immediately and persuade the Iraqi government to end this devastating campaign.

thirdly,

send representatives to the liberated and other areas of Kurdistan to see for themselves the conditions of

thousands of homeless families and the effects of economic blockade, starvation, demolition and extermination.


forthly, extend the much needed humanitarian assistance to the victims of deportation, crackdown and mass extermination measures.

with best regards.

Masoud Barzani
Chairman

Kurdistan Democratic Party (KDP)

5.5.1987



R Ê Z Î M A N A K U R D Î

(Z a r a v ê K u r m a n c î)

- IX -

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (*)

BILINDEKA XURT (1)

77. BILINDKIRINA GOTINÊN NE TEWANDÎ. Rata (cihê) bilindeka xurt ne rêkûpêk (muntazam) e. Di gotinên ku weka mukemmel tên dîtin (bê pê yan paşdanî), ew bi awakî giştî tê ser kîteya dawîn; lê di hin rewşan de, ew dikeve ser kîteya berdawîn. Her dengdêr, dirêj yan kurt, dikare bilindekê bistîne.

78. Gotinên ku bilindeka xurt li ser kîteya dawîn distînin. Ev hemî teşeyên (awa) navî (ên navan) yên ne hevedudanî (nav, rengdêr, "sifet", hoker "zarf"), piraniya teşeyên navî yên hevedudanî, rader (mesder) û û raweyên parnihayî yan çêbiwar (2) in.

Nîşe: Derman, perde, gotin, kuştî, brazava derzîdank, êzing, daristan, şîpane (devê derî), mersef (çiyayê ne bilind, ê ku serê wî pan e), dewlemend, tirsonex, dergevanî.

Kartêkirina (tesîr) yekta (bitenê) ya bilindeka xurt guhertina xurtbûna dengdêra ku ew li ser e ye. Ew nikare, bi tu awayî, tu guhertin li ser awa yan dirêjbûna dengê wê ferz bike: Dengdêreke kurt a ku bilindeka xurt distîne kurt dimîne.

79. Gotinên hevedudanî bi awakî giştî, di rewşa mutlaq de, bilindeka xurt li ser kîteya dawîn a tîpa wan a dawîn distînin.

Nîşe: Cotkarî, havîngeh, virker (derewker).

Em bala xwe bidin ku gotinên hevedudanî gelek caran, ji derveyî bilindeka rêkûpêk a li ser kîteya dawîn, bilindekeke piçûk ku encama (netîce) israrkirina bilindeka ku bi taybetî bi awakî tenha tê ser perça yekemîn e distînin.

Nîşe: Dergevan (dergeh-van)

Ezmandev (ezman-dev)

Keskesor (kesk-e-sor)

Sîngebend (sîng-e-bend)

Herêna (herê-na: Bêqerarî)

Şîpane (şîp-ane)

Seyrangeh (seyran-geh)

80. Gotinên ku bilindeka xurt li ser kîteya berdawîn distînin. Di nav vê celebê de, hin gotinên hevedudanî ku bi alîkariya paşdanî-yên "-ik" û "-î" pêk bûne hene.

Di gotinên hevedudanî de, ku paşdaniya "-ik" distînin û ku sê kîteyên wan yan bêtir hene, bilindekê tê ser a berdawîn. Îcar dengdêra "i" a paşdaniyê pirr zû tê bi lêv kirin.




Darkutik

(*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin, fransîzî-kurdî: Pervîn.

(1) Bilindek: Bilêvkirina xurt a tîp yan kîteyekê: Derman, daristan (bi fransîzî: Accent tonique).

(2) Raweya parnihayî: Cil tê şuştin. Raweya çêbiwar: Cil hat şuştin.

Nîşe: Sorevêrik, erzînik (çene), xelîtik (celebeke rext), malxelîtik (di nav rextê de, bêrika piçûk a fîşekê), teşîrêsik, dirêşik (derziya ku pê çerm tê dirûtin. Kêra ku pê çerm tê jêkirin), gurçîlik (gurçik), tilotêzik (kovika pudra topên leşkerî), strotêzik (eynî mana), sinsiyarik (celebeke teyrên nêçîrê), zengelorik (hestiyê mezin ê pêşiya stuyê zilaman), darkutik, bilbilîtanik (pinpinîk), pîrqelaçik.




Bilbilîtanik

Em bala xwe bidin ku, li gelek navçeyan, bi vê bilindkirina kîteya berdawîn "i" û heta carna dengdarên hawsê (cîran) hunda dibin. Meriv dibêje:

Sorevêrk (sorevêr), erzînk (erzîng, erzîn), xelîtk, malxelîtk (malxelît), teşîrêsk (teşîrês), tilotêzk, zengelork (zengelok, zengelor), darkutk, bibilîtanik, pîrqelaçik (pîrqelaç, piçok).

Gava ku ev gotin bi vî awayî sivik dibin, bilindek cihê xwe ji nuh de li ser kîteya dawîn dibîne.



Pîrqelaçik

NIŞANK I. Meriv dikare ji xwe bipirse ku gelo gotinên cot, weka sorevêr, erzîn, teşîrês û hwd. encama hundabûna paşdanî ne yan, di vajayê vaya de, ew awayên rayî (eslî) yên gotinên jorîn in.

NIŞANK II. Gotinên hevedudanî yên bi "-ik" bi taybetî bilindekê li ser kîteya dawîn distînin, gava ku dukîteyî bin.

Nîşe: Kurîk, dêrik, keçik, kêrik, holik (xaniyê piçûk ê, pîraniya caran, ji textik).

81. Gotinên hevedudanî yên ku bi alîkariya paşdaniya "-î" ava bûne û ku tê de ji du kîteyan bêtir hene, bi awakî giştî bilindekê li ser kîteya berdawîn distînin, eger rêzayê (mana) wan nenêrbarî (mecazî) be.

NIŞE: Garisî, Mêrsînî, Hesînî (navên êlan). Bajarî, destarhêrdî, beredayî, tirsoyî, şerevanî, kenokî, dawerîwandî.

Meriv bala xwe bide ku beşek ji van gotinan hevdengên wan ên ku rêzayê wan nenêrbarî ye hene. Bi rastî, paşdaniya "-î" carna ji bo avakirina rengdêrên ku dikarin weka nav bèn bi kar anîn û ku kirdeya ku karekî dike yan ku rêzayê wê nêrbarî (konkrêt) e nîşan didin, û carna ji bo avakirina navên ku vî karî yan vê nenêrbariyê nîşan didin bi kêr tê.

Gotinên hevedudanî bi "-î", ên ku rêzayê wan nenêrbarî ye, bilindeka wan tê ser kîteya dawîn.

Nîşe: mezinahî, spehîtî, mêranî, pîranî, kêmasî.

Nîşeyên jêrîn ewê nîşan bidin ku çawa, di hin awayan de, ev cihêtiya bilindkirinê dihêle ku meriv hevdengên nêrbarî û yên nenêrbarî ji hevdu cihê bike.

Nîşe: Karwanvanî (ajotina karwanan). Karwanvanî (merivê ku karwanan dajo)

Kenokî (rewşa merivê ku zêde dikene) Kenokî (merivê ku zêde dikene).

Cotkarî (karê cot).


Cotkarî (merivê ku cot dike).

Mazîvanî çûne maziyan (mazî: Meywa "fêkî" dara mazî) (ango merivên ku çûne berhevkirina maziyan).

Mazîvanî ne karê axan e.

Ne jina kenokî, ne mêrê fêtokî "fedyokî" (pêşgotî).

Fêtokî li mêran, kenokî li jinan nayê (pêşgotî).



Meywa Mazî

NĪSANK I. Gotinên hevedudanî ku bi alîkariya paşdaniya "-çi" ava bûne, û ku rêzayê wan hemîyan nêrbarî ye, bi awakî istisnâî bilindeka wan tê ser kêteya dawîn. Em bala xwe bidin ku tuyeke ji wan hevdenga wê ya nenêrbarî tu neye.

Nîşe: Dawaçî (merivê ku li dadgehê dawa vedike), tîfingçî, qehweçî.

NĪSANK II. Bi eynî awayî, gava ku ew dukîteyî bin, gotinên hevedudanî yên bi "-î" bilindeka wan tê ser kêteya dawîn, rêzayê wan çî be.

Nîşe: Mûşî, wanî, botî. Jêlî, kerî, xiyî, memî, remî (navên êlan). Avî (erdê avdayî), bejî (erdê ne avdayî, zuhâ). Kovî (lawirê hov), kedî (lawirê xwedîkirî).

NĪSANK III. Hokerên (zarf) ku bi "-kî" diqedin bilindekê li ser "î"ya dawîn jî distînin: Êvarkî, tenîştîkî, dirêjkî. Kerîkî, tîştîşkî (li piya).

82. BILINDKIRINA GOTINÊN TEWANDÎ. Ragihandina gotinekê bi regezên (unsur) ne herdemî yên paşdanîkirî (parek, nîşandekên awayî, dawîneyên lêkerî) yan pêşdanîkirî (berlêker) bi awakî giştî cihê bilindeka xurt naguherîne. Eva dawîn, di piraniya rewşan de, danîna xwe li ser kêteya ku ji berê di gotina mukemmel de di bin kartêkirina wê de bû dewam dike.

Emê bi rêz imkanên cihê ku dikarin xuya bibin bi nîşandana, ji bo her yek ji wan, istisnaên ku rêzika (qaîde) ku me got bi wan dêşe pişkîn (muayene) bikin.

83. Parek. Hebûna parekeke binavkirinê yan nebinavkirinê (li pişk "fasl" III û IV binêre) tucar li ser rata bilindeka xurt kar tê nake.

Nîşe: Derman: Dermanek, dermanê wî, dermanên wan. Zava: Zavayê min. Dar: Dara mezin, darek, dareke mezin, darine mezin. Mase: Maseya spî, maseke dirêj.

NĪSANK: Giring e ku meriv di navbera pareka nebinavkirinê "ek" û paşdaniya "-ek" yan "-ik" de tevlihevî neke. A yekemîn tucar bilindekê nastîne, lê ya duyemîn ku regezekî herdemî ye dikare wê bistîne (li bend 80 binêre).

Nîşe: Kêr: Kêrek, kêrik. Hol (avahiya girtî ku weka bazar tê bi kar anîn): Holey. Holîk (xaniyê piçûk ê ji textîk). Fort, fortek. Fortek (merivê qurre).

84. Tewandina awayan. Divê ku meriv cihê di navbera gotinên pirkîteyî û yekîteyî de deyne.

1- Di gotinên pirkîteyî de, cihê bilindeka xurt tucar bi hebûna nîşandeka awayî naguhere.

Nîşe: Mehî: Mehîne, mehînan, mehînekê, mehînina.

Dotmam: Dotmamê, dotmaman, dotmamina.

Palevanî (paleyî): Palevanîyê, û hwd.

Şivan: Şivanî, şivanan, şivanekî, şivanine.



P a l e

NÎŞANK I. Emê li dûrtir bibînin ku tewandî-nên awayan, û ya parekan jî, dikarin xwe bi dengdêra dawîn a gotinên ku bi "a" yan "e" diqedin bigirin. Wê gavê, xuya dibe ku bilindeka xurt dikeve ser regezê ragihandî. Bi rastî, ew li ser kîteya dawîn a gotina ku mukemmel dimîne, û dengdêra dawîn piştî hev girtinê, bitenê dengê xwe diguherîne.

Nîşe: Mase: Masa min, masê, masan (awayê têrkerî yê yekejmar û gelejmar).

Pale: Palên gund, palê, palan (awayê têrkerî yê yekejmar û gelejmar).

Mecrefe (bêr?): Mecrefê, mecrefan (awayê têrkerî).

Teşeyên (şekl) ne hev girtî yên nîşeyên jorîn ewê bibana:

Maseya, maseyên, maseyan.

Paleyên, paleyî, paleyan.

Mecrefeyê, mecrefeyan.

NÎŞANK II. Hebûna nîşandekeke awayî dikare bibe sedema ketina dengdêra pareka nebinavkirinê "-ek" û ya paşdaniya "-ik", "-ek".

Nîşe: Keçkê (awayê têrkerî yê keçek).

Keçkê (awayê têrkerî yê keçik)

Hêvdengên ku bi vî awayî tên ava kirin bi bilindkirinê cihê dibin: Di rewşa navê yekîteyî ku bi parekeke nebinavkirinê hatiye nîşan dan de, bilindek cihê xwe yê taybetî li ser rayê gotin dihêle (keçkê, awayê têrkerî yê keçek); di vajayê vava de, gava ku em bînin gotineke hevedudanî ya bi "-ik", "-ek", bilindek tê ser pareka awayî, piştî ketina dengdêra paşdaniyê (keçkê, awayê têrkerî yê keçik).

Nîşe: Keçkê yan keçikê (awayê têrkerî yê keçik).

Keçkê yan keçekê (awayê têrkerî yê keçek).

Kêrkê yan kêrekê bide min (ji kêrek).

Di holkê (yan holekê) de (ji holek).

Di holkê (yan holikê) de (ji holik).

2- Gava ku bi yekîteyan ve tînin ragihandin, nîşandekên awayî cihê bilindekê diguherînin ji bo ku ew bixwe wê bistînin, gava ku ew digihêjin gotinên ku avabûna wan weka li jêr e:

a) Dengdêreke dirêj yan kurt ku di pêş yan paş wê de dengdarek heye:

Av: Avê, avan.

Ap: Apî, apan.

Ol: Olê, olan.

Ew: Ewî, ewê, ewan.



Ba: Bayî, bayan.

Pê: Peyî, peyan.

Se (seh, kûçik): Seyî, seyan.

Dê: Deyê, deyan.

b) Dengdêreke dirêj yan kurt ku di pêş û paş wê de dengdarek heye.

Nîşe: Dar: Darê, daran.

Ker: Kerî, keran.

Dot: Dotê, dotan.

Bav: Bavî, bavan.

c) Dengdêreke kurt ku di pêş wê de dengdarek û di paş wê de duduyên din hene:

Nîşe: Dest: Destî, destan.

Çeng: Çengî, çengan.

Deng: Dengî, dangan.

Hesp: Hespî, hespan.

Yekîteyên ku ji celebên ku me gotin cihê ne her gav bilindeka xwe ya xurt li cihê xwe yê taybetî dihêlin, heta eger ew bi nîşandeka awayî hatibin ragihandin jî.

Nîşe: Stran: Stranê, stranan.

Stêrk: Stêrkê, stêrkan.


Blûr: Blûrê, blûran.

Brûsk: Brûskê, brûskan.

85. Nîşandekên lêkerî. Baş e ku em lêhûrnêrîna teşeyên lêker ên ku nîşandekên wan ên kesîn (rader, raweya parnihayî yan çêbiwar, raweya fermanî "emr") tu nene ji ya lêkerên ku van nîşandekan distînin (demên kesandî) veqetînin.

a) Rader:

Ew her gav bilindekê li ser kîteya dawîn distîne.



Nîşe: Hatîn, ketîn, bezîn, geriyan, çûn.

b) Raweya çêbiwar:

Raweya çêbiwar, teşeyeke navî ku bi alî-kariya paşdaniya "-î" tê ava kirin, li gora rêzikên giştî yê gotinên bi "-î" diçe (li bend 81 binêre). Bi vî awayî, çêbiwarên dukîteyî bilindekê li ser kîteya dawîn distînin; ên ku sê kîteyên wan yan bêtir hene wê li ser kîteya berdawîn distînin.

Nîşe: Kuştî, hatî, ketî, çûyî, kelandî, Dawerivandî, zivirandî, geriyayî.

c) Raweya fermanî:

Ew hergav bilindekê li ser kîteya dawîn distîne.

Nîşe: Bê (ji hatin). Biçe (ji çûn).

Bikeve (ji ketin). Bibeze (ji bezîn).

d) Teşeyên kesîn ên lêker:

Bilindek tucar pêşkerê naguherîne; ew hergav tê ser kîteya dawîn a rayê lêkerî; lê eva dawîn dikare, di hin rewşan de, xwe bi pêşkerê ve bigire û pê re yek bibe.

Emê weka nîşe, ji bo demên buhurî yê lêkerên bi "-in", dema buhuriya dûrdar a raweya pêşker û dema buhuriya nêzik a raweya bilanî, bidin:

Raweya pêşker	Raweya bilanî
<u>Dema buhuriya dûrdar</u>	<u>Dema buhuriya nêzik</u>
Ez hatim	(Bila) ez bihatama
Tu hatî	(Bila) tu bihatayî
Ew hat	(Bila) ew bihata
Em hatin	(Bila) em bihatana
Hon hatin	(Bila) hon bihatana
Ew hatin	(Bila) ew bihatana

Nuha, ji bo lêkerên bi "-an", "-în" û "-ûn", eynî demên geriyan, bezîn, çûn:

Ez geriyam	(Bila) ez bigeriyama
Tu geriyayî	(Bila) tu bigeriyayî
Ew geriya	(Bila) ew bigeriya
Em geriyan	(Bila) em bigeriyana
Hon geriyan	(Bila) hon bigeriyana
Ew geriyan	(Bila) ew bigeriyana
Ez bezîm	(Bila) ez bibeziyama
Tu bezî	(Bila) tu bibeziyayî
Ew bezî	(Bila) ew bibeziya
Em bezîn	(Bila) em bibeziyana
Hon bezîn	(Bila) hon bibeziyana
Ew bezîn	(Bila) ew bibeziyana
Ez çûm	(Bila) ez biçiwama
Tu çûyî	(Bila) tu biçiwayî
Ew çû	(Bila) ew biçiwa
Em çûn	(Bila) em biçiwana
Hon çûn	(Bila) hon biçiwana
Ew çûn	(Bila) ew biçiwana

NÎŞANK I. Weka ku emê li dûrtir bibînin, hemî demên girêdayî celeba ku me li jor dît ji kesê siyemîn ê yekejmar ê dema buhuriya dûrdar ava dibin. Ev kes bi xwe jî bi rakirina dawîneya rader. "-in" jî bo lêkerên bi "-in" (hat, ji hatin; ket ji ketin) û "-n" jî bo lêkerên bi "-an", "-ûn", "-în" (geriya, ji geriyan; çû, ji çûn; bezî, ji bezîn) ava dibe. Di rewşa lêkerên bi "-in" de, bilindek bi vî awayî tê ser kîteya dawîn a rayê lêker (hat, ket; xuyabûna pêşkereke kesîn, ku regezêkî ne herdemî ye, li ser rata nuh kar tê nake (hat-im, ket-im, û hwd.). Di vajayê vava de, meriv dibîne ku, ji bo lêkerên bi "-an", "-ûn", "-în", rakirina dawîneya raderê "-in" cihê bilindekê naguherîne, ji bo ku dengdêra ku ew bi taybetî tê ser wê dimîne (geriya, ji geriyan, û hwd.). Bi vî awayî, kesê siyemîn ê yekejmar ê dema buhuriya dûrdar yê van lêkeran bi dengdêreke bilindkirî diqede; encama hebûna pêşkereke kesîn carma hevgirtin (tu bezî, dêlva tu bezî-î; hon çûn, dêlva çû-in, û hwd) û carna xuyabûna dengdêreke girêdanê tevî imkana guhertina dengê dengdêra dawîn a rayê lêker (ez biçiwama, ez bibeziyama, û hwd) dibe; lê ne ev û ne ew diyarbûne (hadîsa tebîî) dikarin li ser rata bilindekê kar tê bikin; eva dawîn li ser tîpa ku ew bi taybetî li ser e dewam dike, eger ev tîp guhertin bibîne yan na.

Di demên ku ji raweya fermanî hatine (demên tofa siyemîn) de, bilindek hergav li


ser dengdêra ku pišta pêşkerê digire dikeve.

Weka nîşe, emê kesandina lêkerên "ketin" (bikeve) û "rahistin" (rahêje), di dema nuha ya raweya pêşker de, bidin:

Ez dikevin	Ez radihêjin
Tu dikevi	Tu radihêji
Ew dikeve	Ew radihêje
Em dikevin	Em radihêjin
Hon dikevin	Hon radihêjin

NIŞANK II. Di raweya fermanî ya kurdî de hergav, weka ku me li jor dît, dengdêreke dawîn a bilindkirî ku pê re pêşkerên kesîn xwe hevdu digirin, bê ku rata bilindekê biguhere, heyê.

86. **NIŞANKEKE GIŞTÎ:** Xwendevan divê tucar



COTEN GOTINAN

87. Gava ku du gotin di dû hev de tên û ku bi ragihandeka "û" tên girêdan, a yekemîn hergav dirêjbûna dengê wê kêmtir e, yan jî, di rewşa wekheviya dirêjbûnê de, bilêvkirina wê di organên dengdanê de pêş-tirîn e.

1) **Gotinên ku jimara kîteyên wan cihê ye:**
A kurttir tê pêşiyê.

Nîşe: Ga û çêlek.
Şûr û xencer.
Dîk û mirîşk.

2) **Gotinên ku jimara kîteyên wan weka hev e:**
A ku kîteyên wê dirêjtir in tê paşiyê.

Nîşe: Pismam û dotmam.
Çep û rast.
Jin û mêr.

Eger dengdêrên her du gotinan bi qasî hev bin, gotina ku tê de bêtirînen dengda-

ji bîr neke ku rata bilindeka xurt a kurdî ne rêkûpêk (muntazam) e, weka ku me di bend 77 de got. Ango, hemî rêzikên ku hatin nîşan dan istisnaên wan dikarin hebin. Havay çend ji wan:

Jîrkî (ji wê gavê) (li bend 81, nîşank III, binêre).

Avî (bizinê ku hunda bûye) (li bend 81, nîşank II binêre).

Qaqib yan **qaqiban** (beroşa kûr) (li bend 78 binêre).

Cizerî (ji Cizîrê) (li bend 81 binêre).

Palewî (ji Palo) (li bend 81 binêre).

Îro (li bend 78 binêre).

Ji derveyî vana, hin gotinên weka hindistanî, şaristanî (bajarî), frengistanî (ewrupî) û hwd. divên di nav gotinên ku di bend 81, nîşank I de, hatin lê hûr nêrîn bên rêz kirin.

ran hene tê paşiyê.

Nîşe: Dê û bav.

Mil û ling.

Mê û nêr

Gava ku her du gotin dirêjbûna dengê wan bicarek weka hev be, a ku bêtirîn nêzîkî ezmanê dev tê bi lêv kirin tê pêşiyê.

Nîşe: Keç û kur.

Dest û ling.

Rî û rû.

NIŞANK. Zimanê nivîstînê ku îro ava dibe, ji bo sedemên mantiq, ji rêzikên ku di vî bendî de hatine nîşan dan gelek caran dûr dikeve.

Dûmahî heyê

HELBESTÊN XWENDEVANAN

DOSTÊ dil

Ahmed

Ez tenê tenê
ez bi dilê qencî
bi kêf û xweşî
dagirtî;
lê wext, wext
bi zor-zahmetî
barkirî ...

Kes dost nîne
dilê safî
li ber deynim,
dil bû bahr
kul û derda
dihilîne,
îro jî dost nîne
kêf û kula
li ber deynim !...

Insanê bêbext,
bê êminayî û devxweş;
mala dûr
û feqîrî;
hikmê zordest
î bêheqanî
û dilê safî!...
vekirî, bi qencî,
bi xweşî dagirtî:
dihelihê, difûrê
dem dem tê biteqê
lê tije, tije, tije
dimênê !....

8-9-85

Çi bikim?!

Beşîr BOTANÎ

Çi b'kim biyanî me
Bêkes û bê cî me
Jîna min aloz e felekê
Li nav agirî me

* * * *

Çûk im b'tinê me
Şeydayê gulê me
Digrîm û dinalim felekê
Mêvanê gorê me

* * * *

Biyaniyê şîn e
Derd, kul û birîne
Hawar e dê bimrim felekê
Kes dora min nîn e

Sînai-Misir 87

TEBÎNÎ:

Hevalan! Min ne dizanî ku jimarên
miletê kurd li van dewletan çend in!
Va ye ez weke mizgîniyeke biçûk ji we
re dişînim

Libnan: bêtir ji 200.000

Israîl: bêtir ji 120.000

Urdin : gelek hene û na yêne jimartin.

Sînai : bi sedan Kurd hene

Misir : bi hezaran hene

Wesan beşek ji wan kurdî baş dizanin!!!
Li ser vê yekê min Kurdeke Somalî jî di-
tiye!!!

Stirana Gulbiharê

Sebrî BOTANI

Ji devê M. GUNEY

Gulbihar:

Kewo spêdê bixwîne!
Her bixwîne! Her bixwîne!
Tu awaza xoş bîne!
Her bixwîne! Her bixwîne!
Xelkê rake j'vê xewê!
Bihar e xew şîrîn e,

Kewo heke tu d'firî,
careka dî d'zivirî

Bersiveka berkeftî,
bo vî dilê şkestî,

gel xo bîne hey hewar!
Ji wî lawê nediyar

Kew:

Hawar e! Gulê hawar e!
Qeqeba min hawar e!

Warê me her war e!
Bihar ne ew bihar e!

Hawar e! Gulê hawar e!
Hawar e hey hawar e!

Qeqeba min hawar e!
Warê me her ew war e!

Bihar ne ew bihar e!
Derdê me pir dijwar e!

Kewên me jî belav in,
bê pirs û bê silav in

Qeqeb rabin ji xewê!
Guh ne din vê rewewê!

Rewrewa tole û tajî,
yê ne hosta bit na jî!

Qeq-qeq biharê bînin!
Bûka Kurda b'xemlînin!

Qeq-qeq bû, hey qeq-qeq bû,
delîv hat û kes ne bû!

Qeq-qeq bû, hey qeq-qeq bû,
ne b'destê min û te bû!

Qeq-qeq bû, hey qeq-qeq bû,
ya me ne v'ya eve bû!

Qeq-qeq bû, hey qeq-qeq bû,
dergehê şadî vebû!

Qeq-qeq, qeq-qeq, qeq-qeq,
qeq-qeq, qeq-qeq,
qeq-qeq,
qeq
Qix!

Nîşank: Ev helbest ji aliyê Komal Dîlo ji me re hatiye şandin.

ROMAN Û KURTEÇÎROK

TORÎ


Roman di ferhengan de bi awayê çîroka dirêj tê nasandin. Ji vê nasandinê xuya ye ko dema me çîroka xwe dirêj girt, dibî roman. Lê dema ko li azinên (metot) nivîsandina roman û kurteçîrokê (hikaye) hate lêkolîn, wê bi hasanî bê dîtin ko dema çîrok ji aliyê nivîsandina xwe hate dirêj-kin, bi ti awayî nabî roman. Enceq dibî çîroka dirêj. Nexwe ev yek dîyarî me dikî ko ger roman û kurteçîrok ji aliyê azinên xwe bêne veqetandin. Ta em van veqetekan raber nekin, emê, nexasim kesên ko nû bivên roman an kurteçîrokan binivîsin, wê van herdu awaya bi hev bikerçilênin (kariştir-mak). Hege em nevên bikevin van çewtîyan, divê em di warê zaneyîya azinên nivîsandina awayên wêjeyî (edebî) de tekûz bin.

Xwendeyên baldar xweş zanin ko di hunandina awaya kurteçîrokê de hêmana (öge) bingehîn (temel), bûyer (olay) e. Di hunandina çîrokan de bitenê bûyer heye. Gernas (kahraman), an jî gernasên çîrokê li derdora wê bûyerê cih digrin. Bi gotineke din, bûyereke ji aliyê nivîskar, ji bonî nivîsandinê giring hatiyê dîtin. An jî bûyer bixwe bi rojan, bi mehan xwe di mêjîyê nivîskar de nivîsandiye. Nivîskar wê bûyerê êdî ji her alî xweş nas dikî. Rahîştîye wê bûyerê. Bi navgînên (malzeme) din ên nivîsandinê ra xemilandiye û di awayê **bûyer+kes+cih** de nivîsandiye. Bi vê nivîsarê, di azinên kevin de çîrokek efiriye. Di nivîsandina çîrokê bi azinên kevin de bûyer di navîya pêlekê de rêyekê dirêçikênî. Li gora vê rêçikê bi destpêkekê dest bi nivîsandina bûyerê tê kirin. Pişt ra bi bûyerê ve diçin. De bûyer bala xwendeya bikişênî, li deverina de girêkin (dügüm) tê avêtine bûyerê. Di talîyê de jî girêka hatî avêtin tê vekirin. Edî bûyera çîrokê ji aliyê xwende hatîye halîbûn. Nexwe nivîsandina çîrokê di azinê kevin de rêya **destpêk+raxistina bûyerê+girêk+vekirina girêkê** û dawîyandin de tê rêçikandin. Girêk li gora dirêjbûyina çîrokê ne bitenê li deverekê tê avêtin. Nivîskar li cihê pêwîst dîtî, karî girêkên xwe biavêjî çîrokê. Ew jî li gora hostayîya nivîskar e.

Azina çîrokê a ko me li jor der birî (anlatmak), dîsa layî ko me li jor gotî, azinê kevin e. Li gel vê, azineke hunandina (işlemek) din a nû (modern) heye. Bi vê azinê di çîrokê de dema bihurî û dema nûha bi hev re, di demekî de tê derbirin. Sehwr

(düş) û bîrok (ani), axaftina di ber xwe de û axaftina dengîn bi hev re an di rex hev re tê û di dehm de ji yekê tê bihurtin yan din. Lê ez bim, bi ya min bî, ez vê azinê ta heyamekê bikar naênim. Hêj jê ra divê. Divê mercê wê kêliyê bê amadekirin.

Dîsa xwendeyên baldar xweş zanin ko di hunandina awaya (tür) roman de hêmana (öge) bingehîn kes e. Edî ne bûyer, kes giring in. Bûyer li derdora kesê romanê digerin. Kes, bi gotineke din gernasê (kahraman) romanê ji bûyereke dibihurî bûyereke din û bi vî awayî di nav herka bûyeran de ber bi talîyê ve diçî. Bê şik her bûyer di cihekî, di demekî û bi kesine din ra derdikevin ber gernasê romanê. Ew kes li gora bûyer û cih derdikevin holê. Erkên (görev) xwe tênine cih û winda dibin. Ew kes ta talîya romanê bi gernasê romanê ê bingehîn ra naçin. Kesên duyemin bi gernasê romanê ra ta deverekê diçin û cihên xwe didine kesine din. Bi vê yekê gernasê romanê ê bingehîn ta talîya romanê liqayî gelek kes û bûyeran dibî. Bi vî awayî jî di romanê de em mefera naskirina gelek kesan dibin. Ev yek jî nîşeyî me dikî ko di nivîsandina roman de rêya **kes+bûyer+cih** tê rêçikandin.




ereb şemo

DIMDIM

roman

STOKHOLM 1983



Nivîskar di romana xwe de nikarî li gora dilê xwe ruwê azman vekirî, çiksayî an jî bi ewrê tarî nîşe bikî. Hege nîşe bikî, ger ew jî girêdayî hoyina (neden) bî. Ev yek ji bonî nasandina kesê romanê jî wilo ye. Nivîskar nikarî kesê romanê li gora dilê xwe bidî nasandin. Ger kes li gora kirinên xwe bê nasandin.

Kesên romanê bi du awayî têne nasandin:

1- Kes bi piranî bi daxwîyana xwe, axaftinên û bi tevgerên xwe têne nasandin.

Giranbihayîya romanekê bi piranî ji xwedîbextbûyina (inandirici) wê tê. Li gel vê, ji rastekîya (gerçek) gerdûna (evren) wê yî damezrayî, ko di romanê de hatî pêşkêşkirin tê. Ev jî girêdayî jîndarî, zindîtî û ji jiyana rastek hêj rastekîya kesên romanê ye. Bi gotineke din, hege kesên romanê jîndar, zindî û jiyana wana ji jiyana rastek hêj rasttir bî, ew roman xwedîbext e. Li gel vana, divê jiyana kesê romanê a li gora xwe, ji ber xwe hebî. Kesê romanê ger ne ew kes bin ko nivîsara enîya wana ji berê hati bî xêzkirin an nivîsandin. Nekin ko kesên romanê nivîsara ko li enîya wîna hati bî nivîsandin bijîn. Ew kes ger ne dilê nivîskarê romanê bin. Nebin navgînê derdan an lidarkirina hin ramanan.

2- Kes ji aliyê jiyana xwe yî giyanî (ruhsal) tê nasandin.

Lê layî ko tê zanîn ev nasandin, ger di tevayîya romanê de bê kirin. Bi qedana romanê ve ger gernasê romanê bi her aliyê xwe derkevî holê. Lê di warê nasandina kesên ji aliyê jiyana wana yî giyanî de, rêyeke din tê rêçikandin. Bi vê rêyê ji dêla runin dûr û dirêj çêla jiyana gernasê a giyanî bikin, jiyana gernasê romanê bi rawşên civakî ra tê yekbûyin. Wana bi vê rêyê jî ji nav kesên ko em her roj di derdora xwe de dibînin derdixin, dixine nav civakê. Wana bi civakê ra yek dikin, ténine pêpeluka civakî. Dema ko kesê romanê gihaste vê pêpelukê, jixwe ne pêwiste ko em jiyana wî yî giyanî bidine nasandin.

Hoyek ji nivîsandina roman û kurteçîrokan jî, gelek xwendin e. Bawerîya min ew e ko kesê gelek nexwênî, nikarî binivîsî. Rêya nivîsandinê di xwendinê de dibihurî. Li gel tev vana, nivîskar li gel zanîna zimanê gel, hizirên (düşünüş) û jiyana gel, divê ko nivîskar wêjeya (edebiyat) gel jî binasî û di nivîsarên xwe de wana bikar bî. Ya giring zaneyîya wûşa ye. Nivîskarê roman an kurteçîrokan ji kêmayî divê ko deh hazar wûşeyên zimanê xwe binasî li gora rêzimana (gramer) zimanê xwe wana bikar bî.

D ÎROKA KURDISTANÊ DÎ

- IX -


C. Ji 1920 heta rojên me

L I I R A Q Ê

Li Iraqê, dema navbera dawiya şerrê cihanê yê yekemîn û şoreşa 1958 avabûna Dewleta nuh a Iraqê û bicihbûna qraliyeta haşimî dît. Ingilîz, ku li San Remo (1 Gulan 1920) ewê ji S.D.N. (Civaka Netewan) himayeta Iraq û Filistinê bistenda, erkê (wezîfe) pêkanîna welatê ku bi awakî leşkerî vegirtî bû (işgal kirî) stend.

Kêm ji wan Kurd û pirsên wan nas dikirin, û ev yek karê wan zor dikir. Di Kanûna 1918 de, Major Noel li Suleymaniyê Şêx Mehmûd Berzencî (1880-1956) walî (hukumdar) teyîn kir, bi destelatekê (iktidar, sulda) li ser êlên kurdî yên navbera Zabê Mezin û Diyala. Piştî şeş mehan, Şêx Mehmûd serxwebûna Kurdistanê îlan kir (dawiya Gulana 1919), û leşkerê ingilîz diviya wî vegeftine navçeyê. Gava ku ew di şerrê Bazîyan de birîndar bû (17 Hezîran 1919), Mehmûd hat girtin û fermana (hikm) îdamê li wî hat kirin, lê seza (ceza) hat guhertin û ew hat şandin Hindistanê. Di vê navberê de, çend efserên (zabit) ingilîz li Zaxo, Amadya û Akra hati bûn kuştin. Major Soane dêlva Şêx fermandarî (hikm) kir, û zû bêdengî vegeftiya. Zorî bi cihbûna Mîr Faysalê Erebestanê (23 Tebax 1921) weka Qral li Begdadê derketin. Ew ji aliyê Fransîzan ji Şamê hati bû qewirandin û daxwaziya wî hebû ku wilayeta Mûsilê ku Tirkan di xwestina wê de dewam dikir û ku Kurdan dixwest ku ji bo xwe pêk binin ragihîne taca iraqî. Bi rastî, Peymana Sèvres (10 Tebax 1920) mafê Kurdan ji bo serxwebûnê dipejirand (qebûl dikir). Ji bo ku tevlihevî li hemî Kurdistanê çêbû, Şêx Mehmûd hat anîn Suleymaniyê (îlon 1922). Wî nema bitenê navê "hukumdar" dipejirand, lê xwe qralê hemî Kurdistanê îlan kir (Mijdar). Wî hikûmetekê ji heşt endaman saz kir, pûlên postê û yên malî

derxistin, baca (vergi) tutunê rakir û rojnama Rojî Kurdistan ku gelek hûriyan (tefsîl) li ser hemî bûyeran dide weşand (Edmonds, A Kurdish Newspaper: Rhozh-i Kurdistan), di J.R.C.A.S. XII, 1925). Di 24 Kanûn 1922 de, hikûmeta qraliyeta ingilîzî û ya Iraqê "mafê Kurdên ku li hundirê sînorên Iraqê dijîn ji bo avakirina hikûmetekê kurdî di hundirê van sînoran de, bi hêviya ku regezên (unsur) kurdî yên cihê di zûtirîn zeman de li ser awayê vê hikûmetê û sînorên wê û şandina nûnerine berpirsiyar bo Begdadê ji bo ku li ser pêwendiyên xwe yên aborî û rêzanî (siyasî) bi hikûmeta qraliyeta ingilîzî û ya Iraqê re bipeyivin li hev bîn" dipejirand (Edmonds, Kurds, Turks and Arabs, 312; Rambout, 58-9). Lê zû nexweşî di navbera Qral Mehmûd û parêz-



(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wergerandin, fransîzî-kurdî: Pervîn.


A N S Î K L O P Ê D Î Y A İ S L A M Ê D E (*)

kerên wî yên ingilîz û hin Kurdên ku ji destelata wî didexisîn de derketin. Û planên wî bi Tirkan re êrişên Komara Almanî ya Fêdêral ku ew neçar (mecbûr) kir ku pena bibe (iltica bike) Serdeştê (3 Adar 1923) derxistin. Wî li wê derê rojnameke nuh, **Bangî Haq**, weşand û tê de heta 1930, sala ku dawiya himayeta ingilîzî dît, ma.

Ev rejîma rêzanî ya nuh qet rewşa Kurdên Iraqê baştir ne kir, ji bo ku hikûmeta Iraqê xwest ku şagirtên (memûr) kurd ku li navçeyên kurdî diman zû bikişîne û dêlva wan Ereban deyne, û fêrkirina zimanê kurdî di sazandeyên (daire) Bakur de rake. Ev bû sedema nexweşiyê ku awayê serhildaneke vekirî stend, gava ku serbazên (esker) iraqî agir berda gelheya sîvîl a Suleymaniyê (6 Îlon 1930). **Şêx Mehmed** careke din jî serê tevgerê kişand.

Leşkerê iraqî nikarî bû wê bişikîne (Îlon 1930 - Nîsan 1931) û alîkariya Almanya ku pîrr bi hişkî ji aliyê gelek Ingilîzan, û bi hêzanî di Nişankeke (not) General H. C. Dobbs, Komiserê Bilind ê kevn ê Begdadê, de hat rexne kirin xwest; Mehmed hat şandin Begdadê û di bin kontrolê de ma. Di 1930 de, **Şêx Ehmedê Berzan**, xweyîyeke (şexsiyet) ne pîrr mutewazin, li gora gotina Longrigg (86, 103), bi serokekî kurd ê hawsê (cîran) re pevçû. Ji bo ku bêdengiyê vegevine, hikûmet dest bi şerrekî zivistanî, ku wî jî alîkariya Almanya pêwîst kir, kir (li Mumford, Wilson, Crisis binêre). Serhildaneke nuh di 1933-4 de çêbû. **Şêx Ehmed** û birayê wî yê cuhan, **Melle Mustafa**, ku bi awakî leşkerî alî wî kiri bû, li Kerkûkê, paşê li Suleymaniyê, di bin rûniştineke kontrolkirî de man. Di 1941 de, di dirêjayiya maceraya serhildanî ku şikest a **Reşîd Elî Xeylanî** û ya "**Kadroyê Zêrîn**" de, **Şêx Mehmed**, ku jê kelk girti bû (istifade kiri bû) ji bo ku ji Begdadê bireve, tecrube kiri bû ku leşkerên kurdî rake ji bo ku alîkariya Ingilîzan bikin (Longrigg, 295). Di 1943 de **Melle Mustafa Berzanî**, li Suleymaniyê di bin kontrolê de, ji rewşa gidaî (a xwarinê) û civakî ya merivên xwe ne razî, di reva xwe heta zewiyê (erd) Berzan de, bi **Şêx Latîf**, lawê **Şêx Mehmed**, re serfiraz bû û ala serhildanê bilind kir. Kurdek, **Mecîd Mustafa**, ku wezîrê Dewletê hati bû teyîn kirin, ket navberê ji bo ku tevlihevîyê rawestîne. Berzanî xwe xwar kir bi mercê (şert) ku qezayên kurdî bîna gida kirin, ku tê de şagirtên kurd, ne ereb, bîna danîn û ku di dawiyê de li Kurdistanê dibistan û nexweşxane bîna vekirin. Ev mercên ku ji


aliyê **Nûrî Seîd**, **Serok-Wezîr**, ku heta pêkanîna navçeyêke "liwa" bicarek kurdî di xwest (Longrigg, 325) ji aliyê **Mîr Ebd El-Ilah** ne hatin pejirandin, û di behara 1945 de, serhildan bi awayê xurttirîn ji nuh de dest pê kir. Kurd gihajtin çend serfirazi-yên darîçav û leşker şikestinên giran xwarin. Loma, cardin Almanya hat ku rola kutahkerê (xelasker) Iraqê û qraliyeta haşimî bilîze. Di dawiya Tebaxê de, êriş qediya bû. Melle Mustafa xwe kişand Iranê, tevî beşeke ji leşker û destkewta (xênime) xwe (Rambout, 74-80). Çar ji efserên (zabit) wî ku baweriya xwe bi sozên hikûme-



tê ji bo buhurînê (efû) anî: **Mustafa Xuşnavî**, **Izzet Ebd El-Ezîz**, **Muhammed Mehmed** û **Xeyrallah Ebd El-Kerîm**, di 19 Hezîran 1947 de hatin hikm û îdam kirin.

Piştî van bûyerên ku çara wan bi zorê hat dîtin, ji welatparêzên kurd ên Iraqê re bitenê çara xebata dizî ma. Û wan ewha kir. Wan Partî Dêmokratî Kurdistan (P.D.K.) ku ber bi çep diçû ava kir û du bultenan, **Azadî** û **Rizgarî** weşandin. Di hejmar 2 de (Cotmeh 1946), eva dawîn yekîtiyeke ermenî-kurdî diparazt. Di wê heyamê (dem) bixwe de, kolonêl **Elphinston**, serokê polisê bidizî yê **Rojhilatê**, ji xwe dipirsî ku gelo ewê encama (netîce) van tecruban avakirina komareke ermenî-kurdî ya Yekîtiya Sovyêti be. Jixwe gava ku bêdengî vegeviya,

Kurdan ji serbestiya ku ji wan re hati bû hiştin kelk girt ji bo ku bi awakî geş-tir di warê çandî de xebatê bikin. **Kovarên bêjeyî** (edebî) rojê dît. **Dîwanên helbestan û gotarên li ser dîroka Kurdistanê û Kurdên kevn ên navdar hatin weşandin.** Suleymanîye bû navendeke çandî ya gelek jîndar û çirûs-keke gelek geş a welatparêziya kurdî.




ÇAVKANÎ: Special Report of the Progress of Iraq, 1922-1930 (H.S.M.S.O., 1931), Rapport de la Commission d'enquête (C. 400 M. 147, 1925); Note de Sir Henry Conway Dobbs (S. G. 4021, ya 8 Gulan 1931) di Athra, Beyrouth (1 Tebax 1939) de; A. Wilson, Mesopotamia, loyalties, 1914-1917, Oxford 1931; P. Mumford et A. Wilson, The Crisis in Iraq in Nineteenth Century and After, di Review (Cotmeh 1933), 411-422 de; P. Mumford, Kurds, Assyrians and Iraq, di JRCAS, XX (1933), 110-19 de; W. H. Hay, Two years in Kurdistan, London 1922; E. Nolde, l'Irak, origines historiques et situation internationale, Paris 1934; E. Main, Iraq, from mandate to Independence, London 1935; S. H. Longrigg, Iraq, 1900 to 1950. A political, social and economic history, London 1953, 1956. C. J. Edmonds, Kurds, Turks and Arabs. Politics, Travel and Research in North-Eastern Iraq, 1919-1925, London 1957; A. M. Hamilton, Road through Kurdistan, The narrative of an Engineer in Iraq, London 1937, 1958; Y. Malek, The British betrayal of the Assyrians, Kimball Press, N. J., 1935; H. M. Burton, The Kurds, di JRCAS, XXXI (1944), 64-73 de; W. G. Elphinston, The Kurdish question, di Journal of the Brit. Inst. of Intern. Affairs, XXII (Çile 1946), 91-103 de; nivîskar bixwe, Kurds and the Kurdish Qustion, di JRCAS de, XXXV (Çile 1948), 38-51, nexşe; Documentation française, Bref aperçu sur l'évolution politique de l'Irak, Notes et Etudes documentaires, N° 1499, 1500, 1501, 1502 (Tîrmeh 1951).

Kurdistana Iraqê, ji dema îlana Komarê (14 Tîrmeh 1958) heta 1970, gelek guhertinan dîtin. Ev komar dilxweşiya germ a Kurdan, ku bi partiyên din ên rêzanî (siyasî) re beşdar bû bûn xistina qraliyeta haşimî, rakir. Cara yekemîn di dîrokê de, Destûra katî (muweqqet) ya Dewletê vê yekê îlan kir: Ereb û Kurd di vî netewî de hevkar in. Destûr mafên wan ên netewî di hundirê tevayîya iraqî de dabîn (temîn) kirin (bend 3) (li Orient, N° 7 "sêmeha 3mîn 1958", 191-9 binêre). Ji aliyê xwe, general Ebd El-Kerîm Qasim efserên kurd ku di 1947 de hati bûn daleqandin buhurandin (2 Îlon 1958) û izin da Melle Mustafa, ku ji wê mêjuyê (tarîx) pena biri bû Yekîtiya Sovyêtî, ku vegere Iraqê. Ew li wê derê di 7 Cotmeh 1958 de bi dilxweşî hat pêşwazî kirin (istiqbâl), lê hogirên wî yên penaberiyê di Nîsana 1959 de vegeryan. Qasim jê re dergevanên xweyîyî (şexsî) û malekê li Begdadê dan, û ji bo demekê, ew kir amojgarê (muşawir) xwe yê nêzîk. Partî Dêmokratî Kurdistan ku bidizî bû, di bin roja mezin de pêş ve çû û, hema ji Nîsana 1959, rojnama xwe ya rojî, Xebat, ku ji bo derketina wê izin hati bû dayîn, weşand. Kovar û rojnamên kurdî dewlemend bûn û ji wê demê awayekî rêzanî, ne bitenê bêjeyî, stend (Vanly, 84). Lê ev rewşa şahiyê qet dirêj ne bû, û têkoşîna Kurdan ji bo azadiyê bi awayê xurttirîn ji nuh de dest pê kir, deh salan ajot û bi rawestan û ji nuh de destpêkirinên hergav diwartir hat veqetandin. Meriv tê de çar merheleyan dibîne:

Zorî - derveyî û hundirî - ji "pêşengê xwebextker" (fedakar) re ne kêmbûn. Rêzana wî ya mîzanê di dawiyê de herkesî dijî wî derxist, û Kurd bixwe jî, ku bi diltengî li benda bicihbûna sozên ku dereng dihatin bûn, di dawiyê de bi çekan dijî rejîma wî ya diktatorî rabûn. Bi taybetî, Melle Mustafa serê tevgerê kişand (9 Îlon 1961). Ev serhildan qet ne êliyî (eşîrî) bû, ji bo ku, bi rastî, hemî Kurdên Iraqê: Gundî û bajarî, ronakbîr û derebe (fêodal), dijî Qasim blokekê ava kiri bû. Bersiva wî pîr dijwar bû: Dorgirtineke hişk a aborî ji bo birçîkirina Bakurê welêt; bombardmanên mezin bi napalm ku gund û erzaqan şewitandin û jin, pîr, zarok û pêşmergan kuştin, lê ku merdbûna Kurdan elektrîk kir. Di Adara 1962 de, ew malxweyên (xwediyên) bêgûman ên hemî Bakurê Iraqê, ji derveyî bajarên mezin ku tê de leşkerên hikûmetê bi cih bû bûn, bûn. Şikestinên leşker vî şerrê ku stîlê wî bicarek kolonyalist bû zû negelerî kir. Serbaz (esker) direviyan yan xwe digihand dijmin; abor û bazarganî keti bûn sifir. Şelpeyek (darbe) hat amade kirin, û Kurd - ku bê wan tutişt nikarî bû bê kirin - pê hatin agahdar kirin. Di berbanga 8 Sebata 1963 de, Qasim bi awakî trajîk ji meydana

rêzanî hunda dibû û, hema roja din, Kurdan agirbirînê îlan kir. Baas li Begdadê hikm stend. Lê gava ku Kurdan bêalîyîya xwe anî bîra hikûmetê, wê bi paşîştinan bersiv dida. Li gel vê qasê, gotûbêjan dest pê kir û heta, di 24 Nîsan 1963 de, Kurdan Mêmorandomeke hûr (bitefsîl) ku tê de daxwaziyên xwe digotin pêşkeş kir (Orient, N° 26 "sêmeha 2mîn 1963", 207 - II). Lê, gava ku hikûmeta baasî xwe xurt dît, parlamenterên kurd hatin girtin, ultimatomekê îlan kir (10 Hezîran 1963) û, di wê rojê bixwe de, dijîtiyê bi hişkiyeke mezin ji nuh de dest pê kir. Ji bo ku, di vê navberê de, Baas hikm li Şamê jî stendi bû, Sûriyan alîkariyeke xurt da hevalên xwe yên iraqî, bi şandina balefîran û leşkerê Yermûkê. Kurdan zû eva dawîn rakir. Wan boseyên (kemîn) xwe pîrr kirin, binkeyên (merkezên) leşkerî û karwanên teqemenî (zexîre) stendin û bi sedan girtî kirin. Leşkerê iraqî, şikestî û stûxwar, îcar bi "Dergevanê Netewî" girt. Ew piştgirê hikûmetê, ku hovîtiyên wê dijî kommunist û hemî dijkarên hikûmetê protêstoyan li hemî cihanê derxistin, bû. Bi şelpeyeke nuh ku ji aliyê leşker hati bû pişt girtin, General Ebd El-Selam Arif Baas rakir û hemî destelatan xistin bin destê xwe (18 Mijdar 1963). Lê tevgerên leşkerî dewam dikir. Berzanî bangî Xaç Sor a navnetewî kir (Îlon 1963; Vanly, 319-21), û Kurdan xwe da ber Papa, bi hinceta (munasebet) gerra wî li Zewiyê Muqeddes (2 Çile 1964; l'Orient, Beyrût, N° 5240 "4 Çile 1964"; metnê temam di C.E.K., N° 30, 82-8; li Mauries, 95, 96 binêre).



Ji bo ku, di dawiyê de, ji pîrsa kurdî re çare bibîne, marêşal Arif agirbirînekê, ku Melle Mustafa tavil pejirand, bê ku dîtina polîtburoyê P.D.K. hibîne, pêş neyar kir (10 Sebata 1964). Kurdan, ku bi qasî Iraqiyan dixwest ku bîna xwe bistînin, ji vê agirbirînê kelk girt (istifade kir) ku ji cihana derveyî re rewşa rast bidin nasîn, bi saya rojnamevanên biyanî ku hatin serdana (ziyaret) wan; teqemeniyên xwe yên xwarin û çek nuh kirin. Hikûmeta Iraqê ku bi projeyên zayî-mirî yên yekîtiya erebî xerîk bû (mijûl bû), rewşê ewha hişt, ji bo ku wê bawer dikir ku zeman ewê hertiştî bi westabûnê rast bike. Lê qet ewha ne bû, û Kurdan, gava ku didît ku li daxwaziyên wan bi awakî ciddî ne dihat nêrîn, piştî Cotmeha 1964, biryar stend ku otonomiya xwe ya hundirî pêk bînin. Wan şagirtên sazdeyî (memûrên idarî) di hemî pileyan (derece) de tayîn kirin, bacan (vergi) danî, di dadgehan (mehkeme) de dadiyê (edalet) kir. Û, bi taybetî, leşkerên xwe çêtir biçek û amade kirin. Li ser kongra Vîmîn a P.D.K. (1-7 Tîrmeh 1964), baregayên (merkezên) giştî, ya şoreşê (9-10 Cotmeh 1964) û pêkanîna nuh a Partî û Destûrê (17 Cotmeh), li Vanly, 227-244 û li metnên: Constitution, 375-6, Loi administrative, 376-7 binêre. Li ser pêkanîna leşkerî, berhem bixwe, 244-8; Pradier, 219-23.

Lê agirbirîna Sebata diviya boraneke (krîz) giran di hundirê tevgera serhildana kurdî de, di navbera Berzanî û Polîtburoyê P.D.K. de, ku di broşûreke ku di 19 Nîsan de hat weşandin: "Lihevhatina Arif-Berzanî, aşîtiyek yan paşvegeranek?" wî itiham kir ku wî, bi vê lihevhatinê, ji amancên şoreşê re xiyanet kir. Û heta pevçûneke xwînî li Mawatê, di 17 Tîrmeh de, di navbera leşkerên nahez de derket. Di kongra Vîmîn de, 14 ji 17 endamên polîtburowê - bi hêzanî Ibrahim Ehmed û Celal Talabanî - ji partiyê hatin avêtin û li Iranê pena bir. Ev borana ku sedema cihêtiyên dîtinan di navbera teorisyen û rëalîstan de bû, kartêkirina (tesîr) wê, li gel xerabûnên wê, li ser bûyerên leşkerî yên paşê ne bû (li Vanly, 218-25; Pradier 203-9, Viennot, 95-111; Arfa, 149-52 binêre).

Lê nevekirîbûna rewşê di navbera Kurd û Iraqiyan de diviya zû rabe. Di 10 Gulana 1964 de, hikûmeta Iraqê Destûreke nuh a katî (muweqqet), ku li ser mafên Kurdan ku bi awakî vekirî di bend 3 ya Destûra 1958 de hati bûn pejirandin bêdeng ma, îlan kir. Ev yek ji bo Kurdên ku, ji aliyê xwe, leşkerên xwe bêçek ne kirin ne bû. Êrîşa beharê di 4 Adar 1965 de ji aliyê leşkerê iraqî hema temam bû (piyade, tang, balefir), û di serê wî de general Ebd El-Rehman Arif, birayê serok, bû. Di destpêkê de, wê çend serfiraziyên navçeyî stendin (Adar-Gulan) lê, di havînê de (Hezîran-Îlon), şerrên xwînî di zincîra Safîn de

çêbûn. Bajarê piçûk ê Penciwîn ê têkdayî (xerakirî) ji aliyê Iraqiyan hat vegirtin. Di hemî demê de, gava ku Kurdan cara yeke-mîn top bi kar dianîn, Iraqiyan gazên bijar bi kar dianîn, lê wan şikestinên giran dîtin (4194 kuştî, 2201 birîndar, 12 tangên têkdayî û 5 balefirên ketî). Misir piştî Iraqê digirt (Le Monde, 23 Cotmeh). Şerrê zivistanê (22 Kanûn 1965 - dawiya Sebat 1966) ji nuh de bi xurtî dest pê kir. Di 1 Çile 1966 de, Berzanî Mêmorandomekê şand O.N.U. (Rêxistina Netewên Yekbûyî) (metn di Vanly, 378-9 de). Di 13 Nîsan 1966 de, marêşal Ebd El-Selam Arif di qezayekî hêlî-kopterê de mir. Birayê wî, general, di cihê wî de, li serê Dewletê hat bijartin. Di roja vê mirinê bixwe de, êrişeke nuh dest pê kir ji bo ku serhildanê bicarek rake. Ev şerr, ku ji 12 Nîsan heta 15 Hezîran ajot, bi hêzanî di Gulanê de bi şerrê Rawendûz yan Hendirîn navdar bû, "Verdun"ê Kurdî, weka ku şahidek, R. Mauriès (171-213) jê re digot, û ew bû şikestin ji bo Iraqiyan ku li gel bikaranîna mezin a napalm, 1056 kuştî, 476 birîndar, 600 mîllîs, "Siwariyên Selahiddîn", li derveyî şerr û destkewteke mezin hunda kirin. Kurdan, ji aliyê xwe, bitenê 38 kuştî û 85 birîndar hunda kirin. Li gel îlanên serfiraziyê, piştî agirbirîneke ku ji 15 Hezîranê ji aliyê hikûmetê hat xwestin, lihevhatineke ku ji aliyê serok-wezîr Bezzaz hat gotûbêj kirin (di 28/6/73 de mir) di Hezîran 1966 de hat imza kirin (Vanly, 379; Viennot, Thèse, II, 189-92). Bi rastî, hin bendên veşartî hin otonomî ji Kurdên Iraqê re dipejirand. Arif II çû serdana Berzanî (28 Cotmeh) ji bo tecrube bike ku li hev bîn, ji bo ku baregayê serekî yê iraqî ku ji "planê Bezzaz" ne dilxweş bû hertiştî dikir ku wî têk bide (xera bike). Ji nuh de, pirs dirêj û giran çûn. Lê şerrê israîlî-erebî yê 5-11 Hezîran 1967 diviya kartêkirina wî li çend welatên ereb, ango li Iraqê jî, hebe. Li wê derê, şelpeke nuh (17 Tîrmeh 1967) bicihbûna Ehmed Hesên El-Bekr weka serokê Komarê dît. Şelpeke duyemîn (30 Tîrmeh 1968) di dû wê de hat. El-Bekr hemî destelatan stendin û diktatoriya baasî "Dergevanê Netewî" yê xwe ku di 1963 de qet bîranînên baş ne hiştî bûn jinuh de bi cih anî. Dema ku Kurdan hêza xwe ya maddî û manewî digirt û bi vekirina 300 dibistanan di 1968 de di warê fêrkirina pêşîn de cehdeke mezin dikir, hikûmet bi Kurdên veqetayî re dilîzt, zanîngehekê (bi zimanê erebî) li Suleymaniyê û "liwayê" nuh ê Dehokê li ba Kurdan ava dikir û qet nebe ji nuh de destpêkirina dijminayiyê amade dikir. Di destpêkê de, çend lêxistinên piçûk çêbûn, paşê şerr di Nîsanê de li dora Koy-Sancakê dest pê kir. Leşkerên iraqî diviyan bajarên Kela Diza, Penciwîn, Çwarta berdîn; paşê, di Hezîranê de, destê xwe avêt gelheya gundî ya deştên Erbil, Halabca û Badînanê, û rezan bi napalm û



asîd sulfurîk av dan. Di Tîrmehê de, kolêra li Kela Diza xuya bû. Di Tebaxê de, nijad-kujiya (qetliam) Dakanê, li Şêxanê, bû. Di Çile de (5/1/1970), l'Express îlan dikir ku di navbera îlon û Kanûn 1969 de, Kurdan êrişa iraqî bicarek rawestandî bû; 151 balefir di şes mehên dawîn de hatin daxistin. Û di Çile 1970 de, rejîma baasî gotûbêjan bi Berzanî û polîturoyê wî re dest pê kirin. Delegasyonê kurdî, di bin serokatiya Dr. Mehmûd Osman de, çû Begdadê û, di 11 Adar de, lihevhatineke ji 15 bendan li Nawperdanê, li Kurdistanê, di navbera herdu aliyan de ji bo rawestana şerrekî neh salî, hat imza kirin (metn di Kurdish Facts, Sebat-Adar 1970 de). Kurdan otonomîya xwe ya hundirî û serokatiya-alîkar a Komarê stendin. Zimanê kurdî dibû zimanê fermî yê duyemîn ê Iraqê (metnê erebî di El-Cumhûriyye, Begdad, N° 704, ê 12 Adar 1970 de; metnê ingilîzî di Kurdish Facts, Sebat-Adar 1970 de; metnê almanî, Nebez, Kurdistan, 232-5). Pênc Kurd wezîr hati bûn teyîn kirin, buhurîn ji her du aliyan hati bû îlan kirin. Cêjnên mezin vê bûyerê pîroz kir. Lê hemî pirs ne hatin rast kirin: Tecruba kuştina Melle Mustafa (29 Îlon 1971), tevlihevî li Sincarê (havîna 1972), gotûbêj li ser dayîna zewiyên Kerkûkê piştî xwemaliya şirketa I.P.C. (1 Hezîran 1972). Di Hezîrana 1973 de, Bangek ji bo Kurdistana Iraqê, ji bo bicihanîna lihevhatina 11 Adar 1970, ji aliyê tevayiyekê û Afrîka Reş hat weşandin (Le Monde, 15 Hezîran 1973).

Çavkanî D. Adamson, The Kurdish War, London 1964; D.N. Schmidt, Journey among Brave Men, Boston 1964; R. Mauriès, Le Kurdistan ou la Mort, Paris 1967; J. Pradier, Les Kurdes, révolution silencieuse, Bordeaux 1968; Dr. S. Rastgeldi, Det glömda Kriget. Rapport from Irakiska Kurdistan, Stockholm 1967; E. Haraldsson, Med uppreisnarmönnum i Kurdistan, Skuggsja 1964; nivîskar bixwe, Land im Aufstand ... Kurdistan, Hambourg 1966; F. de Sainte Marie, Irak rouge?, Paris 1960; P. Rossi, l'Irak des révoltes, Paris 1962; B. Vernier, l'Irak d'aujourd'hui, Paris 1962; Centre d'Études Kurdes (C.E.K.), Paris: L'épreuve kurde, livre jaune sur le Kurdistan irakien N° 14, 15, 16, 17, 18 (1961), relevés de la presse internationale, N° 20 (1962), le dossier du Kurdistan du Sud dit "Kurdistan"


d'Irak, N° 30 (1965), Informations sur le Kurdistan, N° 31, 32, 33 (1965); S. Gantner (J. P. Viennot), le mouvement national kurde, di Orient, 32-33 (sêmeha 4mîn 1964, sêmeha 1mîn 1965), 29-120 de; nivîskar bixwe, Documents pour servir à l'histoire du mouvement national du peuple kurde en Irak, berhem bixwe, 353-402; I. C. Vanly, Le Kurdistan irakien, entité nationale. Etude de la Révolution de 1961, Neuchâtel 1970; J. Nebez, Kurdistan une seine Revolution, Munich 1972; C.J. Edmonds, The Kurdish War in Iraq: the constitutional background, di The World today, 24/12 (Kanûn 1968), 512-20 de; nivîskar bixwe, The Kurdish War in Iraq: A plan for peace, di JRACS, LIV/1 (1967), 10-23 de; The Kurdish National Struggle in Iraq, berhem bixwe, LVIII/2 (1971), 147-158; Edgard O'Ballance, The Kurdish Revolt, 1961-1970, London 1973.

KURDÊN SÛRIYE Û LUBNANE

Ji derveyî çend malbatên mezin û merivên wan ku bicarek erebbûyî ne, weka Beraziyên Hema, begên Akkar, serokên dirzî yên Cumbulat (Can Bolad "Can Pola"), Kurdên Sûriye û Lubnanê rewiştên (exlaq) xwe yên rayî (eslî) paraztine, li gel ku hin ji wan li wê derê ji çend sedsalan, û bê gûman berê hatina himayeta fransizî, bi cih bûne. Wan hema tu pirseke rêzanî ji destelata himayetê re dernexist û karî bû tevgerê çandî ya pîrr geş pêş de bibin. Pareke wan a fireh di pêşveçûna aborî ya Cezîrê de hebû (Rondot, Les Kurdes de Syrie, 94, 99; A. Mu'awwad, El-Ekrad fî Lubnan we Sûriyya, Beyrût 1945). Lê zoriyên rêzanî di bin rejîmên cihê de, ji 1957 û plana "Piştê erebî" (1963), derketin. Paşê, bi behana çareserkirinê (rêforma zirafî), zewiyên gundiyan hatin stendin, û 120.000 Kurd ji

netewahiya (cinsiyet) sûrî hatin xistin, û bi vî awayî wan mafê şagirtbûnê, şandina zarokên xwe dibistanên Dewletê, pejirandin di nexweşxanên dewletê de hunda kir. Hemî pirtûk û muzîka kurdî hatin qedexe kirin. Navên gundan hatin guhertin û dêlva wan navên erebî hatin dayîn û tê de Erebe dêlva Kurdên ku hatin qewirandin hatin bi cih kirin (I. C. Vanly, Le problème kurde en Syrie, 1968; li Mun. Talib Hilal, Dirasa 'ela Muhafazat El-Cezîra min el-newahî el-qewmiyya wel ictima'iyya wel siyasiyya, 1963, weşandina I. C. Vanly, 1968); nivîskar bixwe, La persécution du peuple kurde par la dictature du Baas en Syrie, Amsterdam, Cotmeh 1968. (Th. Bois)

Dûmahî heye



DESTANA SİYABEND Û XECÊ Û ÇAPA BIYANÎ

Amed

Gava neteweyek dikeve bindestê neteweyekê, her tiştên netewa bindest li ber lingên zordarên netewa zordest diçin. Gelê Kurd ji nav gelê cihanê barekî giran û sitemeke neadamtî (1), di vî warî de, bi para wî ketiye. Ziman jê hatiye birrîn, hatî (2) bi netewên zordest maye, çand û folklor hatine û têne binax kirin, dizîn û herimandin, dîrok hatiye berûvajî kirin, welat hatiye parve kirin, û namûs û mal hatine û têne talankirin. Armanç, bê gûman, jê ewe ku xêr-bêrên welatê Kurd, Kurdistanê, bidosîn û bikurritin.

Berxwedana gelê Kurd jî, helbet, li hembera wan sitemkariyan ne a niçmiriye (3). Berxwedan li dijî herdu aliyên çewsandinê; çinayetî û netewî, a geşe û roj bi roj gumreh dibe. Raste, îro, em wek ku têye xwestin li folklorê xwe xwedî derneketine. Ev yeka hanê ji pir sedeman hatiye. Wekîdinê, ez bawerim lawên gel ên mandê dê vî karî baş bi serî bikin.

Destana "Siyabend û Xecê" tu gûman li ser nîne ku ne a Kurdî be. Di Kurdistanê de, destana "Siyabend û Xecê" destaneke navsere (4). Ji çapa biyaniyan bi navê "Siyabend û Xecê" du pirtûk ketine destê min. Yek a E. Ebû Zira' (5) e û a dinê a Hiwanîs Şîraz (6) e. Herdu pirtûk, bi rastî, dilê mirov tirş dikin, nemaze a E. Ebû Zira'. Ez, di vê gotarê de, dixwazim wan herdu pirtûkan beramberî destana "Siyabend û Xecê" a folklorî bikim. Min destana folklorî ji devê Ehmedê Nêsir (gundê Ş. Çiyayê Kurmênc), di sala 1985-an wergirt (Celîlê Celîl jî ji devê wî destana "Siyabend û Xecê" girt. Hên ew çap nebûye). Teve (7) beramberkirinê, ez dikim têbînî û rexneyên xwe, li gora nêrîna xwe, li ser wan herdu pirtûkan diyarkim.

E. Ebû Zira' - gotinê naxwaze - xwestiye di saya gelek nav, derew û tiştan de nejadperestiya Ereben zordest bipeçine û avsunekê (8) çêke; ji xwe re bi talde (9) ke, û xwe pê veşêre. Mêrikî wek ku mejiyê wî

xwestiye bi destanê lîstiyê û nivîsandiye. H. Şîraz jî xwestiye nêçîrê di ava herimî de bike. Wî jî, helbet, wek ku wî dil kiriye destan nivîsandiye. Herduyan jî vîroziya neguhartina destana folklorî di piştî guhên xwe re avêtiye.

Eger mirov, bi rastî, bala xwe hûr bide pirtûka ku E. Ebû Zira' nivîsandî, mirov wî di pir ciyan de digre. Pêna (10) ku wî ev destane nivîsandiye, mirov hest dike ku ew hîngê qey nû ji dêya xwe bûbû, û her bûyerekê bi nav, bi sînor û bi dîrok tev ezber kirine. Di pêşgotina pirtûka wî de ev xweş diyare. Di wir de, ew bi xwe distrê û bi xwe jî tew dike (11). Ji serê destanê ra (12) ku tu digihêjî binê destanê E. Ebû Zira', di tala xwe re, bûyerên wê dirêj kirine, pan kirine, fireh kirine, vezelandine, û şor têde pir kirine û lihev anîne. Heta ku ji wî hatiye gemara mejiyê xwe xistiyê ye; bê ku rûmeta destana folklorî bigre. Bi kurtî, ez dikim serektirîn têbînî û rexneyên ku min di pirtûka wî de derxistinî, diyar kim:



(1) Neadamtî: Nemirovanî. (2) Hatî: Mîrat, wereset. (3) Niçmirî: Jar, lawaz, sist. (4) Navser: Navdar, binavûdeng. (5) E'î Ebû Zira', xulî li serê te be hey dara Be'îvê, Siyamend û Xec, belavokên Dar el-Kîtab el-Erebî, Sûriyê 1986. (6) Hiwanîs Şîraz, Çîrokeke Evînî, Şanogêriya Siyamento û Xeca Zarê, wergerandin bo Erebî: Nîzar Xelîfî, belavokên Dar Sîvan, Beyrût. (7) Teve: Digel. (8) Avsûn: Malkek ji çiqilî û piçên daran tê ava kirin. Nêçîrvan wê çê dike ku xwe têde veşêre da ku nêçîr wî nebîne. (9) Talde: Sîtar. (10) Pên: Gav, dem, kat. (11) Bi xwe distrê û bi xwe jî tew dike: Bi xwe ji xwe re lêtîne û mor dike. (12) Ra: Heta, heya.

1- Ka çavikên (13) van gotinên wî yên jêrîn?:

- a) Ev bû 600 û hinek sal ev destane di devê çîrokbêjan de dijî (rûpel 6).
- b) Kurd dibînin ev destane a vê heyamêye: 1100-1500 z. (rûpel 8).
- c) Ev destane digihêje dawiya dewleta E'basî (rûpel 8).
- d) Ev destane hemdema talanên Teter û Mongol li ser gelê Erebe (1232-z.) (rûpel 8).

2- Ji devê kê ev destane wergirtiye? Ji ku ye? Li ku rûdinê? Wî zînar (14) ew hewal nedane. Tenê gotiye: "Ev destane wê bi navê min - ne yê kesekî dinê - were nîşan kirin". E. Ebû Zira' çawa destan bihîst? Çawa zanî bû? Bêçavik, gelo, çêdibe?

3- Piştewaniya êlina Ereban ji Kurdan re li dijî Osmaniyan û destgirtina wan di ser serê Kurdan re ji layekî de, û biratiya Misilmanî ji layê dinê de, gelo ne avsûn be ku ew pê zordestiyên Ereben nejadperest dipeçine? Wî daye xuyan ku ne ji Ereban bûya Sultan Hemîdê Tirk wê Kurd talan bikira. Di destana folklorî de navê Ereban, di vî warî de, kok (15) nîne (rûpel 89-112).

4- E. Ebû Zira' serê destanê û binê destanê ji felsefa misilmanî, gotinên Quranê, dengkirinên Pêxember û hwd. pirtûka xwe jê dagirtiye. Ev tiştên hanê hemî ji ber xwe derxistine û bi destanê ve qemitan-dine (16) da ku mejiyê xwe yî olperest û kevneperest pê têr avde. Destana folklorî, di vî warî de, ji pirtûka wî çihê dibe.

5- Pesinandineke ji ber xwe, yeke bêtir mêtazfîzîkî, daye Qederê. Di rûpela (106-107) de dinivîsîne: "Karê min - Qeder dibêje Siyabend - bi awakî gişane ye, qolayîtir û hêsantire ji yê tekane. Di gunehkariyên gişane de ez mîletekî an neteweyekê li dijî yeke dinê dihêvojim ta ku yek ê dinê qirr dike, û, li vê derê, ez jî bi xwe lê sêr dikim". Gelo gunehkariyên gişane hene? Di cenga Sedam-Xomênî de, herdu gelên Iraqê û Iranê a gunehkarin heta ku ji herdu seriyan bi hezaran mirov dikevin û dimrin? Şênîyê Hiroşîma û Nagasakî a gunehkar bûn ra ku teresên Emerêkî yên impiryalist bi bomba etomî ew şewitandin? Ev yeka hanê eşkere xuya dike ku E. Ebû Zira' dixwaze berjewendiyên çîneyetî bincil bike û veşêre; ango xuliyê di nav çavê gel de wer dike.



6- Qeder di destana folklorî de cara yekê derdide (17) û cara dawiyê vedixwe (18). Qeder di pirtûka E. Ebû Zira' de, bi carekê dernade û tu hêz jê xurttir û gewretir nîne. Li vê derê, wî destan li gora bîr-baweriyên xwe yên Misilmanî yên hişk guhartiye. Olperestiya wî ya koravî nehîştîye ku ji rûmeta qederê dakeve û jê kêmbibe.

7- Nîgarkişandina Qederê di pirtûka wî de a bê bend û rade ye. Ra ku wî kariye Qeder bilindtir kiriye, mezintir kiriye, xurttir kiriye, zanatir kiriye û h.w.d.. Di rûpela (109) Qeder dibêje Siyabend: "Kekê Siyabend, xem nake. Ez bûme birayê te. Çi xem bigihê te, digihê min jî. Çi te şa bike, min jî şa dike ... Tikaye, tu ji ber min tiştêkî veneşêrî dengke, kekê Siyamend ...".

Heger Qeder her tişte, çito ne yî agehdare ku Siyamend î sitembare? Ev çî dijayetiye?

8- E. Ebû Zira' pirtûka xwe bi navê "destaneke efsanî" nîşan kiriye. Ev ji aliyekî de. Ji aliyê dinê de, wî di pêşgotinê de gotiye ku ew xudanê vê destanê ye. Diyarê E. Ebû Zira' li bêka HOMER bi nêrîneke şaş diçe. Di heyama Homer de waqasî zanîn ne wekî niha pêşketî bû. Bi ser vê

(13) Çavik: Serçav, jêder. (14) Zînar: Yekcar, kok. (15) Kok: Zînar, bi carekê. (16) Qemitan-din: Leziqandin. (17) Derdide: Zîrar dike, dixisir. Derdan: Zîrar, xisar. (18) Vedixwe: Biserdikeve, kar dike. Vexwarin: Karkirin, serketin.

gişî de, dîsa Homer da ye xuyan ku wî destanên xwe (Ilyad, Aneyad) ji devê gel wergirtine û li cem xwe neafirandine. Ev çi nanokî ye? E. Ebû Zira' negotiye destan ji kê wergirtiye, navê pirtûkê daniye "destaneke efsanî", û li ser xwe bi nav kiriye; digel mêrxasiyeke helbestvanî, torevanî, pexşane, û efirandinî di pirtûka xwe de çêkiriye. Gelo ew tiştên hanê dikevin seriyane? Destan bi xwe neynika rewş, ponij û jîna gelane. Nabe kesek di tala xwe re biguhêre, pê bilîze û xwe lê bi xudan ke.

9- Evqas navên kesên destanê, dîrok û ciyên bûyerên wê ji ku anîne:

- a) Xec bi sê sala ji Siyabend biçûktire. (rûpel 53).
- b) Siyabend bi sê salan ji êlê bi dîrket (rûpel 60).



- c) Nîvê dudiyê ji meha avdarê (rûpel 11).
- d) Siyabend û peyayên xwe çûne Nisêbînê (rûpel 101).
- e) Estane (Istenbûl) 29 Nîsan 1070 (rûpel 112).
- f) Salih axa, Mihdîn axa, Nûra, Narê, Rihan, Hemîd, mela Cim'a, Ibrahim, pêşnimêj Şehab, Ebdil Rezaq axa, Sultan Reşad, sultan Hemîd, mela Ebdil Selam, Mîr Me'n, Mîr Wesab, Sidqî axa, û h.w.d.

Evqas nav, cî û dîrok di destana folklorî de dernakevin. Bi taybetî, dîrok kok di destanan de nîne.

(19) Nîhad: Wujdan, demîr.

Karê Hiwanîs Şîraz jî ne kêmfî yê dinêye. Wî jî navê pirtûka xwe daniye: "Çîrokeke evînî, Şanogêriya Siyamento û Xecazarê". Mirov wê pirtûkê bixwîne, kok bêna şanogêriyê nade. H. Şîraz jî di tala xwe re destê xwe wekî dil xwestiye dirêjî destana "Siyabend û Xecê" kiriye. Va ez li jê rexne û têbîniyên xwe derbareyî pirtûka wî de jî diyar dikim:

- 1- H. Şîraz Siyabend, di pirtûka xwe de, kiriye Ermenî û Xec kiriye qîza Kurdekî axe. Di destana folklorî de, Siyabend kurê rênçberê Kurde, ne yî Ermenîye.
- 2- Çîrokên destana folklorî dîrî yên H. Şîrazin. Wî hundirê destanê ji binî de guhartiye û bi rengekî teze û nûjen nivîsandiye; ango, nêzîkî an jî li ser nêrînên êkolên vê sedsalê nivîsandiye. Gelo êkolên niha li ku û destan li ku?
- 3- Di pirtûka xwe de, ji min ve wer tê xuyan, H. Şîraz bi rengekî nîşane xwestiye çêra rewşên reş ku li ser Ermeniya de hatinî bike. Dîsa bi awayekî neqendî û nîşane xistiye stoyê Kurda bi navê begekî Kurd. Dîrwelatî û koçkirina Ermeniya bi rengekî ne eşkere, di pirtûkê de, ji Kurdan de hatiye zanîn: "... bavê Xecê, we Kurdê axa, Siyabend, şivanê Ermenî, diqewtîne û dibêje: "Çiyayê Sîpanê ne yê te ye, ne jî peravê Behra Wanê ...", Siyabend li ber peravê Behra Wanê rûdine, hêstiran dibarîne û dibêje: "Bi xatirê we, Sîpan, bavê mino. Behra Wanê, dêya minê. Bi carekê, em ji hev cuda bûn ... Bi xatirê te, tu jî, dilbera minê (Xec). Bila bavê te bizane, ku çi çêbibe ez vegerim. Xewa mêrxasan di bin sitemê de nayê" (rûpel 30).

"... Bihare, Xec derketiye deştê û di dilê xwe de bi Siyamend re dipeyive: Wax li minê! wilo mirov ji behrê, dêya xwe, û ji çiyê, bavê xwe, bi dîrdikeve.. eger tu naxwazî ji bo min vegeî, ca ji bo behra Wanê vegere ... evîndarê bê nîhad! (19) Te çawa Behra Wanê û çiyayê welatê xwe ji bîr kirin?... " (rûpel 33).

"... li vegera Siyamend bi şev bo welêt, hawar û fîxana yekî dikeve guhên wî pêna ku nêzîkî geliyekî tarî dibe: Dizan bigrin. Şûra dikşînine me. Keriyê pezê me ji me distînin. Bidine dû..." (rûpel 41).

"... Siyamend pêz vedigerîne û kal dixwaze pezekî ji wî re serjêke, Siyamend dibêje: Na, bila bimîne. Mirazekî min heye. Bila bimîne ta ku ez vedigerim" (rûpel 45).

"... Siyamend ji cem kalê vedigere, hildikşe çiyê û distrê: Hîv dibin ewran de wenda bû ... " (rûpel 47).

"... Siyamend distrê: Keriye peze min standin. Çiyayê min ji min standin. Seba hezkirina qîzê, destê min kirin sindiyê (20)... Xecê! ên ku dixwazin hêviyên min biqurîçnin, wekî bavê te, pirin..." (rûpel 59-60).

"... Siyabend ji çiyayê Sasonê dadi-keve Bîngolê û distrê: Kengî biyanî wê koça xwe ji Çiyayê Sîpanê barkin..." (rûpel 63).

"... Siyamend li ser bîranînên Çiyayê Sîpanê didagirî: Beg! berxê min î biha ji min stand ... Kengî Çiyayê Sîpanê li min vegere ... " (rûpel 66).

"... Gava ku Siyamend tîrkevanê xwe rahişt û da pey gayê reş da ku bikuje birayê begê zavê xwe di pişt zinaran de veşartibû ku tola birayê xwe, zaveyê kuştî, ji Siyamendê ku destgirtiya wî revandî, bistîne ... " (rûpel 100).

"... Gava ku Siyamend gayê reş avête erdê, xençera xwe deranî ku dilê gê derxîne û ji dilbera xwe re bibe, ji nişkavde, hey wax! ga girgîn bû, an tîrekî nû hate avêtin û li Siyamend ket?... " (rûpel 103).

Gelo mirov kûrkûr bala xwe bide van deqên ku min ji pirtûka wî wergirtinî, dê çi bibêje? H. Şîraz, gelo ne xwestiye ku di pirtûka xwe de çêra nakokiyên sînori di navbera Ermeniya û Kurda de bike? Bi rastî, ev tişteki nexweşe ji nivîskarekî mîna wî re. Herdu welatê me, Kurdistan û Ermenistan, ji aliyê rêjîmên Tirkan de hatine dacîr kirin. Çi pêna ku serbestiya Kurda û Ermeniya pêk bê, hîngê, wê gavê, mirov dikare çêra kêşeyên (21) wiha bike. Gelo, başe em herdu gel li ser tişteki bê heyîn bikevine gewriyên hev û dijmin rihet-rihet me ji hev - wekî berê - bidize, me sist bixîne û pûç bike? Gava ku H. Şîraz Siyamend kiriye şivanekî ermenî û Xec kiriye keça Kurdekî axe, ango wî xwestiye bibêje ku dîrwelatiya Siyamend (şana gelê Ermenî) bi destê begên Kurdan bû. Çi maldarên gelên bindest hene bi gelemperî destmistikên (22) maldarên gelên serdestin ji bo ku berjewendiyên xwe yên çîneyetî biparêzin. Maldarên gelên bindest dîvikên maldarên gelên serdestin û maldarên gelên serdest (ên zordest, çi li Rohilata Navîn, çi li Efrîqa, çi li Emerîka Latîni) dîvikên imperyalîstane. Ica, bi vî awayî, merî dibîne ku hên maldarên me yên Kurdan dîvikên dîvikane; ango, dûvçilkin. Dûvçilk, eger ne a gelfiroş, welatfiroş û xwefiroş bin, serbestiya pêkanîna ber-



jewendiyên wan wê were birrîn. Em dizanin hin begên me yên dûvçilk wê kuştargeh ji Ermeniyar re çê kiribin ji ber ku ew ji aliyan zordestên Tirk de dihatin ajotin. Bi taybetî maldarên Tirkên zordest didane têla cihêbûna olê çi ku Tirk û Kurd yekî bûn û Ermenî File bûn. Ev yeka hanê nahêle ku em bibêjin gunehê gelê Kurd e. Tu hukumet li Kurdîstana Bakur ji begên Kurd re peyda nebûn heta ku Ermeniya biçewsînin û ji Ermenîstanê biqewtînin. Pirek ji Kurdan û ji Tirkan ji Ermenî ji kuştargehên ku bi destê zordarên Tirk de dihatinî kirin, parastin. Ên ku Ermenî çewisandinî maldarên Tirk ên zordar bûn.

A rast ji H. Şîraz re, pêna ku destanê diguhêre bere bavê Xecê bikira Tirkekî axe, ne bikira Kurdekî axe. Kurdên me yên axe yên dûvçilk di wê demê de - gotinê naxwaze - ji bo parastina axatiyên xwe wê gelek pîsî kiribin. Em yekê dibêjin û yekê nabêjin. Em, li vê derê, helbet çêyiyên axe û xanedanên Kurd ên ku doza serbestiya gel û welêt kiribûn, navêjine pişt guhên xwe. Kurdan tucarî meramên xwe tinebûn ji axa Ermenîstanê bibirrin û bi ser Kurdîstanê ve xînin. Meramên birrîne û zepkirîne di serê rêjîmên Tirk de hebûn. Hîva Ermeniya - ne wekî H. Şîraz gotiye - kete bin ewrên rêjîmên Tirk ên zordest, ne begên Kurd ên dûvçilk...


Siyamend, Şivanê Ermenî, dibêje: "Kengî biyanî koça xwe ji Çiyayê Sîpanê barkin?". Gelo yên biyanî kî ne? Tirk bin an Kurd bin? Ji serê pirtûka wî û ra dawiyê zînhar şora "Tirk" têde nîne.

(20) Sindî: Qeyd. (21) Kêşe: Mesele "bi fransizî: question, cause". (22) Destmistik: Alet, tişt, adet "bi fransizî: moyen".

Li gora pirtûka H. Şîraz, bavê Xecê Kurde û Siyamend î Ermeniyê. Bavê Xecê ji bo nedana Xecê Siyamend qewitand û biyanî kir. Vêca, em dikarin bibêjin, di çavê Şîraz de, ên biyanî Kurdin.

- 4- H. Şîraz mirina Siyamend di dawiya pirtûka xwe de neqendî dihêle. Mirov nizane hele gayê reş Siyamend di jêr wer kir û ew kuşt, an tîrê birayê zavayê kuştî ew gêre jêr kir û ew kuşt. Di vê derê de ew dudilî dike û newêre biryara xwe bistîne, çima ku "birayê zaveyê kuştî" şana Kurdaye û "gayê reş" şana Qederê ye.
- 5- H. Şîraz di guhartina destanê de avsunek ji xwe re ava kiriye ku meram û mebestên wî pê neyên naskirin. Avahiya avsunê wî kêşeya çîneyetî ye di navbera derebegê Kurd û xezanên Ermenî û Kurd de: "...Hevalên Ermenî û Kurd, piştî ku Zarebeg (bavê Xecê) ew ji bo Siyamend qewitandin sond xwarin: Siyamendo, em a sondxwarî ne ra ku em a xweşin em nahêlin mûyek ji porê te tiştêk pê were. Kurdê xezan birayê Ermeniyê xezane..." (rûpel 59).

Çima H. Şîraz zînar navê Tirkan nahêner zimanê xwe? Gelo raste nivîskarekî pêşverû destaneka gelekî li gora nêrîn, mebest û armancên xwe, di talde berberiya çîneyetî di navbera axeyên neteweyekê û xezanên wê neteweyê û neteweya xwe, bigihêre? Ev avsun, mixabin, ber çî digre?



(23) Babetekî: Mewdû'î, objectif. (24) Mak: Dê. (25) Gav: Dem "période". (26) Gava derbasbûnê: "Période transitoire".

Piştî ku min têbînî û nêrîna xwe derbareyî wan herdu pirtûkan de dan, ezê niha analîsîsa xwe li ser destana folklorî pêşkêş bikim. Berî analîsîsê ez dixwazim bersiva ev pirsê girîng bidim: Evqas rexne min li ser wan herdu pirtûkan dan, gelo, rindiyên wan jî tine bin?

Gava ku nivîskarek bixwaze destaneka gelekî ji nû de binivîsîne rê ji her kesî re vekiriye. Wekîdinê, pêwîste armanc û meramên wî li pişt wê ducarekirinê a babetekî (23), mirovanî û dadmend bin, ne ku nivîskar hatî û folklorê gelekî bihermîne û berûvajî bike. Gelek nivîskara berhemên hev ducare kirine wekî Şêkispîr, Gotê, Kirîstofer Marlo, Meksîm Gorkî û ên dinê. İca, guhartina destana "Siyabend û Xecê" li nik E. Ebû Zira' û H. Şîraz bi tonekî taybete. E. Ebû Zira' di pirtûka xwe de zihêr xistiye nav hunguv. Ew misilmaniya xwe - dîrî a folklorî - ji me re şirove dike, û xuya dike ku êlên Ereb, eger, destên xwe di ser Kurdan re negirtana, sultanê Hemîdê Tirk wê şîneka giran ji Kurdan re çêkîra. H. Şîraz jî xwestiye dîrwelatî û çewsandina Ermeniya û zepkirina Ermenistanê ji layê rêjîmên Tirk de bixe stoyê begên Kurda. Gelo rindiyên van herdu pirtûkên hanê li ku man?

Dawî, ma ez analîsîsa xwe ji destana folklorî re diyar kim. Min bi xwe ji devên çirokbêjan guhên xwe daye du-sê çavikên vê destanê. Ew çavikana pir nêzîkî hev bûn. Analîsîsa min derbareyî çavikê E.N. de ye. Ez naxwazim dakevim bûyerên destanê bi hûrgilî diyarkim. Tenê ez dixwazim binêzîkayî xuya bikim ku ev destana a kîjan gerxê ye; bê ku ez xwe dîrokzan bibînim wekî hinekan ji ber ku dîrok di destanan de dernakevin.

Destana "Siyabend û Xecê" qîza çerxa ku pêwendiyên maldarî, di Emperetoriya Osmanî de, nû ava dibûn, û yê derebegî nû bere pûçbûnê dirizîni. Sêwîbûna Siyabend û navkirina destanê bi navê "Siyabend û Xecê" şana bûna maldariyê. Siyabend ketibû nava du agirên: agirê maldariyê û yê derebegiyê. Derebegî hat û ol bi xwe re anî. Maka (24) felsefa olperestî derebegiyê. Maldarî pêre gihişt, li dijî felsefa derebegî rabû ser lingên xwe û li ber xwe da. Berxwedana Siyabend li dijî Qederê şana vê yekê. Destana "Siyabend û Xecê" girêdayî gava (25) ku maldarî nû serî dida û şîn dihat, û derebegî nû bere kifîkbûnê diçû; angû, gava derbasbûnê (26) ji derebegiyê bo maldariyê.

Siyabend baweriya xwe bi konê felekê nedani. Gûman û sewda wî - wekî Hemlêtê Şêkispîr - ku konê felekê heye, an na.

Vêca, meraqa wî ku bigihê konê felekê û ew sewd û gûman ji serê derkevin. Qeregêtran (Qeder) ji wî re dibêje ku felek heye. Ew dibêje: Na, nîne. Ka raberî min bike?

Siyabend lawê rênçberêkî Kurde (Ehmedê Silêmanê Lequt) û Qeregêtran lawê begekî Kurde (Hesen beg). Felsefa bega dibêje: Felek heye û a rênçberên ku nû dikirinî bibin maldar, dibêje: Nîne. Gava ku Siyabend berê xwe dide Xana Henterê ji bo ku hûr-mûrinî xwe bîne da ku ew û Xec bi mal bibin, Qeregêtran li ber Xecê datîne. Çend gava bi dûr dikeve, dîsa Siyabend vedigere. Baweriya wî bi Qeregêtrên nîne ku li ber Xecê deyne. Di pê re, Siyabend lingên Qeregêtrên dike sindiyan, bi darekê ve girê dide û diçe. Heta ku ew ji Xana Henterê vedigere, êla Şikêk Qeregêtran kuştin ji bo Xecê bibin. Siyabend dibîne ku çavekî Qeregêtrên hatiye girtin û cavek vekirî li hêviya wî maye. Di kuştina Qeregêtrên

de, maldar dibînin ku Qeder tişteke bi destê derebegan peyda bûye û mirov kare pê bawer neke, jê netirse û ji serê xwe bavêje. Ew çavê vekirî jî şana ku êdî derebegî dimre û li hêviya ku maldarî cî bigre.


Mirina Siyabend di dawiya destanê de ew jî Qeder e. Ma çima Siyabend bi Qederê bawer nake û bi destê Qederê dimre? Pêna ku pêwendiyên derebegî nû kifikî dibûnî û yên maldarî nû serî didan, derebeg hên a li ser lingên xwe bûn û ji maldara di wê çaxê de, bi hêztir bûn. Li vê derê teşeya civakî-aborî ya maldarî ji ya derebegî jartir û qelstire. Gava ku berberiyek (27) di wê tezebûnê de dinavbera derebeg û maldaran de peyda bibe, helbet, aliyê derebegan; ango, felsefa wan dê bi serkeve. Loma (28) Siyabend jî, li dawiyê, bi destê Qederê dimre. Destan bi xwe berxwedana maldariyê li dijî derebegiyê ye da ku li şona wê kulavê xwe rêxe erdê.

(27) Berberî: "Conflit". (28) Loma: Lew.



HUNDERMENDÊN KURD: BRÎNDAR

Derwêş



D.- Tu karî çend gotinan li ser Brîndar bêjî?

B.- Brîndar di sala 1964 de li gundekî Nisêbînê hatiye dinê. Di navbera salên 1976-77 de têkiliya wî bi tevgera şoreşgerî re çêbû û giha zanîna hebûna xwe û welatê xwe. Piştî 1978 dest bi nivîsandina helbestan kir û di 1979 de kasetên xwe weşandin. Di sala 1979 de kasetek li ser qehremanê milletê Kurd M. M. Barzanî - li ser mirina wî - weşand. Piştî wê du kasetên din jî li welêt weşandin. Wî jiyana xwe a heta bi sala 1980 li Nisêbînê derbas kir. Berî hatina cunta faşîst a Tirk bi du mehan jî ber hin sedeman derket derveyî welêt.

D.- Tu niha li ku dimînî?

B.- Ez niha li Swêd dimînim. Ez berê ne li Swêd bûm, li welatekî din bûm. Lê ji ber imkan û mecalên kêr ez çûm Swêd û heta niha jî li wir dimînim.

D.- Li Kurdistanê xebata te li ser Muzîka te çawa bû. Li Ewropa di çi rewşê de ye? Cudatiya navbera wan çawa dibî?

B.- Weka min li jor jî diyar kir, li Kurdistanê sê kasetên min - ji xeynî yê ku li civatan hatine dagirtin - hatin weşandin. Ev her sê kaset li gor rewşa ku ez tê de bûm, hati bûn amade kirin. Ango helbest tev helbestên şoreşgerî xwedînaverok polîtîk bûn. Xebata min a welêt, bi hacetên kevn, pêk dihat. Ango bi nûjenî ne bû. Hem ez bixwe wê çaxê di merhela destpêkirinê de bûm û hem jî hacetên ku me pê muzîka xwe çêdikir ne hacetên pêşketî bûn.

Piştî ku ez hatim Ewropa, bê gûman hem di muzîka min û hem di min bixwe de hin cudatî çêbûn.

A yekê, li Ewropa muzîk û tembûra min ji dema berê pêşdetir ketin. Ez li vir fêrî hin teknîkên tembûr û muzîkê bûm.

A duduyan, li welêt cihaz û hacetên nûjen bi dest ne diketin. Ji bo wê, kaset bi awakî kêr dihatin weşandin. Gelek caran me kasetên xwe bi teyban dadigirt, bêyî ku em herin studyo. Jixwe di dema me de li Nisêbînê studyo ne bûn. Lê li Ewropa niha ew imkan jî hene.

A sisiyan, li welêt, min û herweha gelek hunermendên din, bi awakî teng li huner û muzîka kurdî dinêrî. Her çiqasî, me muzîka xwe ji bo gelê Kurd û di riya rizgariya netewê Kurd de çêdikir jî, lê di naveroka helbestên xwe de me giranî dida ajîtê û dengvedana rêxistinekê an partiyekê. Me li vir, dîtina rêxistina xwe a siyasî helbestên gel ên klasîk gotin. Niha kasete min a şeşan di destê min de amade ye. Ew bi tevayî ji helbestên min pêk hatiye. Di demên pêş de li gor imkanên xwe û ên dost û hogiran ezê wê pêşkêşî gelê xwe bikim.

D.- Hêviya te heye ku vegerî Kurdistanê?

B.- Ma hêviya kê tune! ... Ma kî naxwaze vegere welatê xwe û di nava gelê xwe de, di nava xwedî û xwedanê xwe de bijî!

Bê gûman, ez jî wek her Kurdekî mihacir bi hesret û evîna welatê xwe



rojên xwe li mihaciriyê derbas dikim. Ez bawer nakim, merivê ku ji bo ser-xwebûna welatê xwe bixebite, bê hêvî be. Her Kurdê welatparêz li derveyf welêt bi hêviya vegera welêt e. Ji bo jîndariya vê hêviyê jî demek dûr û dirêj divê. Ango, heta ku welatê meriv ji bin destê dijmin dernekeve, mercên vegeerê jî bi cî nayên. Yan jî encex li Bakurê Kurdistanê şerekî çekdarî dest pê bike, heta ku em jî karibin herin, wek neferekî di nava şer de cî bigrin û şerê neyar bikin. Wê çaxê hêviya vegeerê şax dide û jîndar dibe. Lê hêviya min naşkê, ji ber ku insanê bê hêvî nikare di vê rîya fîraz (muqaddes) de berdewam bike.

- D.- Ji Têkoşer û kovara "Têkoşer" re dixwazî tişteki din bêjî?
- B.- Berî her tiştî ez kar û xebata Têkoşer pîroz dikim û ji bo vê hevpeyvînê spasdar im. Bi rastî, Têkoşer, li gor ku

ez dibînim, xizmeteke mezin ji bo nasandina rizgariya netewê Kurd dike. Hem ji aliyê çandî û hem jî ji aliyê diyarkirina dîrok û hebûnên Kurdî de kar û xebateke hêja dike. Têkoşîna çandî û hunerî parçek ji tevgera rizgariya netewê Kurd e. Jixwe em li Ewropa nikarin Kurdistanê rizgar bikin. Encex em karin li kar û xebata çandî, hunerî, edebî û her wekî din bimeşînin, hebûnên xwe bi gelên Ewropî bidin nas kirin. Hebûnên xwe yê veşartî derxin holê û wana berûpêş bibin.

Têkoşer yek ji van kovaran e ku vî karê hêja dike. Ji vê yekê divê her Kurdekî welatparêz alîkarî û piştgirtina xebata Têkoşer û yê wek wê bike, da ku ew karibin di xebata xwe de geştir bibin.

Ez cardin spasî we dikim û serketin û serfiraziya we dixwazim.



D. ÎZOLÎ: FERHENG A KURDÎ-TIRKÎ

Derwêş

D.- Kekê D. Îzolî, min ji zû de bihîsti bû ku tu li ser ferhenga Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî kar dikî. Ev ferheng çap bû. Çend gotinan li ser xebata xwe a ferhengê dibêjî?

D.Î.- Ji sala 1960 î vir de zîraniya (me-raq) min li ser zmanê Kurdî heye. Lê, tu keysa min nebû ko ez zanistiya zmannasî bixwînim. Di rewşa kirêkarî de zêdeyî 20 sal e li Ewropayê me. Hemû wêşanên Kurdî ko çap dibin, dipirsim, lêdigerim û dikirim. Wan hûr-hûr dixwînim. Ne ko bo naveroka wan e, zêdeyî degeliya min li ser bêje û pêkhatina hevokan e. Carinan zor tiştên xweş dibînim û gelek kêfa min ji zmanê Kurdî re tê. Heta bo vê yekê ez, tîpên Erebfî û Rûsî jî fêr bûme û wêşanên wan jî dixwînim. Astengiyên min yê mezin tunebûna ferhenga bû. Zmanê Kurdî mîrî nebûye û heryek di wêşanên xwe de bi zêdeyî devokên herêma xwe dinvîsin; ev jî normal e, dixwazim wisa jî bibe. Bi vî awayî gelek bêjeyên nû û talde de mayî der tên. Mîmkûn nîne ko em hemû têbighîn. Lê bivê-nevê, ferheng divêt. Ne yek an du; bi dehan ferheng divêt. Gava ko tişteki dixwînim û ténagehîm çi dibêje, wê gavê jî bêhna min teng dibe an jî dibû. Pêşî de ew bêjeyana min kom kirin, ko hewce be lê binihêrim, dawî ko zêde bûn ramana ferhengê kete dilê min...

Dema ko kes çênake, çima ez çênakim, ma çima ez jî ne kes im! Bi rik û înad, daxwazekî xwepêşandanî min destpê kir. Destpêkê de tişteki piçûk di fikra min de hebû, rojberoj pêşve çûm û dawî jî, ji xwe meztir tiştekan deranî.

D.- Ev çend sal e tu kar dikî ku vê ferhengê biqedîni?


D.Î.- Pêşî sala 1970 yî min yekî piçûk çêkirî bû. Lê hê neqediya bû. Ew wînda bû. Li pey wê 6-7 sal derbaz bû, metirsiya min nebû ko carekî din destpê bikim. Sala 1976 de min li Holendê komelek bê mîrî (ne resmî, îlegal) rast kir. Ev metirsiya min ji wê komelê hat û min dîsa destpê kir. Lê ji bo ferhengeke zanistî, sala 1980 yî şûnda biryar girt.

D.- Di xebata 8 salan de çi zehmetiyên amadekirinê hebûn?

D.Î.- Zehmetiya mezin tenêbûna min bû. Min divêt wêşanekî an pirtûkekê temamî bixwînim û bêjeyan jê derînim. Hemû tişt jî bihra mirov de namîne, carinan wisa dibû ko min bêjeyek 10 caran, 15 caran nvîsiye. O nvîsina vê jî bi serê xwe zehmetek bû.

D.- Tu xebata xwe a vê ferhengê "Gava duymîn" bi nav dikî. Bi vê çi dixwazî ji me Kurdan re bêjî?

D.Î.- Ev pirs zor giring e. Di standardê ferhenga de em zor paşda mane. Ferheng bi tenê bêje rêzkerin nîne, yanê lîsteya bêjeyan nîne. Ferheng, divêt di zman de bersîva her tiştî bide. Yekem û girîngtir divêt bêje bi rêzmanî bêne grûbandin, karûbarên lêkeran berçav bibin, navên coxrafî û bêjeyên teknîkî yên biyanî bêne xuya kirin. Ewana di vê ferhengê de rave bûne. Wekî din jî navên heywanan û rehekan (nebatan) bi latînî jî şanî bûne ko naskirina wan hêsan dibe. Herwekî brayên Bedirxanan ji me re Elîfba û rêzman û wîjeya Kurdî de gavê yekem danîn, lêbelê mixabin rêzmanek di şûnda nehiştin. Ta niha jî kesî ew pêşve nebir. Zerengiya xwe piçûk be jî di zaniyariya xwe de gava duhemîn e. Ferheng bi hin kêmasiyên xwe ve zanyarî ye (bilîmsel) e.



D.- Di xebata xwe de ji çi û çawa alîkarî wergirt? Awayê xebata te çawa bû?

D.Î.- Yekemîn alîkariyên min serkaniyên Kurdî bûn. Ew jî di dawiya ferhengê de lîsta wan heye. Hawar û rêka Hawarê hîm û armanca ferhengê ye. Awaya xebata min ew e. Pêşî min pîvana 8x10 sm. kart kirrîn. Hemû bêjeyên komkirî û yên rojberoj derve dihatin her yek li ser kartekê dinvîsandin. Ew kartana li ser rêza elîfbayê dikirin rêzê. Bêjeyên ko ducar hatine nvîsîn di rêzê de diyar dibin, ew dibijartin. Paşê li ser van kartana yekoyek dixebitîm. Di rêzman û ansîklopedî û ferhengên biyanî û pirtûkan de grûb û drûvên wan bêjeyan didî û li ber wan dinvîsî. Paşê daktîlo kir. Min dikarî vê ferhengê ev qasî din stûr bikim, lê bi rastî ez zor westiyam. Ji xwe giring ew e ko sîstema wê ye, hîmê wê ye.

D.- Di weşana ferhengê de çi zehmetî hebûn?

D.Î.- Ji bo min nvîsandina xwe gelek zehmet bû. Çapxane yên Holendî nepejirandin. Ez diviya bûm bi îmkanên xwe bidim çapê û min wisa kir.

D.- Ta niha te wekî din çi weşandiye? (Navên wan, salên weşana wan û naveroka wan).

D.Î.- Sala 1979 de min pirtûka **Mela Mahmût Beyazîdî "Adetên Kurdistan"** ji nû ve çap kir. Di nîva gel de zêde belav nebû û xwendevanan zor guh nedanê. Lê li gor min ew pirtûk yek ji klasîkên Kurdî ye û divêt her Kurdek bixwîne. Salên 1981-82 de jî du pirtûkên min yên piçûk derketin:


a) **Lêgerînen li Kurdistan:** Bi kronolojîk şoreşên Kurd, parçekî jiyîna Serok Barzanî û hinek çîrok û gerf û stran û helbest in.

b) **Jiyan li Kurdistan:** Ew jî çîrok û helbestên bakurî Kurdistan in. Bi Kurmanciya herêmê Dêrsimê hatine çap bûyîn. Min bitaybetî wisa kir. Xwezî hemû kes devokên herêma xwe binvîse. Li pêşhatiyê de bo zmannasan gelek bikêr tê. Hinek dibêjin wer e, hinek dibêjin wilo ye, lê wisa herdu jî rast in. Kîjan ku netewî bû ew Kurdî ye.

c) **Nîşanî û Moriyê nenê** jî du pirtûkên Kurdiya Sowyetê ne, me kirin Latîni.

D.- Planên te pêş me çi ne?

D.Î.- Dixwazim vê ferhengê bi Holendî peçve bikim. Ger yek du braderên arîkar peyda bikim dixwazim bi Kurdî-Kurdî ferhenge-



ka 6-7 sed rûpel çêkim. Alî din jî min zor dil heye ko kovareke wekî kovara "Têkoşer" li Holendê derînim, lewra Kurdên li Holendê di vî barî de zor sist in. Lê mixabin ko mecal nabînim. Him xwendewar nîne, him jî rewşa Kurdan di parçebûna siyasî de rojberoj astengên mezin saz dikin.

D.- Merov ji ku dikare ferheng û pirtûkên te peyda bike?




D.Î.- Dixwazim bidim komel û rêxistin, ez bi xwe nikarim pey bigerim. Ta niha KSSE - liqê Holendê û Berlîn û Komkar û komela Têkoşer pejirandin. Lê ji yên din hê bersiv nehatiye. Bi postê dikarin PB. 16109. BC.2500 Den Haag Holanda re pêwendî bikin.


D.- Dixwazî tiştêkî din bêjî?

D.Î.- Gotina giring îro li ba min ew e, zor tika dikim Kurdên li Ewropa bila destê xwe ji pêşîra hevûdu bikişînin. Ew bi vî awayî nagêhîjin tu cihekê! a diduyan jî kesên welatparêz ko ji xwe re "devrimci" dibêjin; ji kerema xwe yek du rûpel jî Kurdî binvîsin an bixwînin. Raste zman her tişt nîne, lê bê zman jî dîrahî (mesafe) di navbera însan û dirindeyan de kême dibe. A dawîn bêjim: Gava heval xwandin û nvîsandinê de bêjeyên biyanî bikar tînin - ko beramberî wan Kurdî nîne - bila fedî nekin û ji wan netirsin. Dinyayê de hîç zmanek nîne ko sedî sed safî be. Heçî ko dinya piçûk dibe û teknolojî pêşve diçe zman jî têkilî hev dibin. Wekî din, heçî rexne li ser ferhenga min binvîsin an jî navnîşana jorîn re bişînin ez zor dilxweş dibim. Hon jî di xweşiyê de bijîn

Nîşank: Bersivên pirsan D. Izolî bixwe ew nivîsîne û ji me re şandine. Me ji aliyê zimên tutişt ne guhertiye.

NEWROZ 1987





X E B A T A M E

28 ADAR

Newroz li Zanîngeha V.U.B., li Bruxelles. Bernama me, bi kurtî, bi vî awayî çû:

- Dilvîn, keçeke cuhan, çar perçeyên kurdî li pyano lîzt.
- Rojnamevanê belçikî, Marc Hoogsteyns, diyapozîtivan li ser Kurdistanê Iranê nişan dan û agahdariyeke balkêş li ser rewşa gelê kurd da.
- Koma Têkoşer dîlanên kurdî pêşkeş kirin.
- Evîn stranên şoreşgerî û geleri stiran.
- Piştî rawestaneke kurt, Koma Niştiman, Arnhem - Hollanda - dîlanên kurdî kirin.
- Koma zarokan stranên sivik pêşkeş kirin.
- Birîndar jî stranên şoreşgerî û evînî stiran.
- Li derve, komelên cihê pirtûk û belgeyên xwe raxistin, û xwarin û vexwarin hatin firotin.

3 - 5 NISAN

Li Palais des Congrès, li Bruxelles, sê roj bi navê "2èmes Assises Européennes Pour le Droit d'Asile" li ser mafê penaberiyê "iltica" li Ewropa hatin pêk anîn. 300 kes ji 20 welatên ewrupî yê cihê beşdar bû bûn. Her roj çend kes li ser hin babetan dipeyivîn, piştê jî nav salonê beşdaran pirs dipirsîn yan dîtina xwe digot, û paşê em di nav komikên cihê de vediqetiyên ji bo ku pirsên giring bi awakî kûr bîn lêhûrnêrîn. Gelek caran, ji aliyê kesine ku konfêransan çêkirin û ji yê beşdarina li ser pirsê kurdî hat peyivîn. Li derveyî salonê, Têkoşer sê rojan pirtûk û belgeyên kurdî raxistin.

18-26 NISAN

Li ser vexwendina (dawetiye) Enstituya Kurdî ya Parîsê, endamek ji Têkoşer 9 rojan li Barselona, paytexta Komara Katalonya, li Ispanya, beşdar bû seminerekê li ser zimanê kurdî, zaravê kurmançî (li rûpel 3 binêre).

1 GULAN

Me pirtûkên kurdî di şeva Partiya Karkeran a Sosyalîst de raxistin.

1 GULAN

Me di şeva Partiya Kar de jî pirtûk û belgeyên kurdî raxistin.

23 GULAN

Em beşdar bûn şeveke çandî ku ji aliyê gelek rêxistinên hati bû amade kirin, ji bo piştgiriya penaberên "multecî" ku di kampa "Petit Château" de, li Bruxelles, di mercên "şertên" gelek ne baş de dijîn û ku grêveke birçibûnê çêkiri bûn.

25 GULAN

Civîneke çapê li Parlamana Ewropa, li Bruxelles, ji aliyê Zanîngeha Aştîyê, Journées Internationales de la Paix û rêxistinên din hat amade kirin. Mêvanê şevê Adolfo Perez Esquivel yê Arjantînî, ku di 1980 de xelata Nobel stendi bû û ku li herderê cihanê digere ji bo parastina mafê mirov û gelan, bû. Ew dîrûdirêj li ser pêwendiyên aborî û rêzanî yê Bakur û Başûr, ango yê welatên dewlemend û xizan, peyivî. Endamek ji Têkoşer, ji nav salonê, li ser damezranan (bi tirkî: yapı) taybetî (xusûsî) yê rejîmê faşîst ê Tirkiyê û li ser pelixandina gelê Kurd peyivî. Salon ewqas tije bû ku cih tu ne bû ku meriv rûnê.

DI MEHÊ DE CAREKÊ

- Civînên Koordinasyona Mafên Mirov û Gelan.
- Civînên Mafê helbijartinên şaredariyî ji bo biyaniyan.
- Civînên Komelên civakî yê şaredariya St-Josse.

2èmes
ASSISES
EUROPEENNES SUR LE DROIT D'ASILE

Programme

BRUXELLES
PALAIS DES CONGRES
3.4.5
AVRIL 87

TÊKOŞER'DEN HABERLER

28 MART

Brüksel Üniversitesi V.U.B. 'de Newroz bayramını kutladık. Program böyle idi:

- Dilvîn, dört Kürtçe müzik parçasını piyano ile çaldı. Dilvîn, genç bir Kürt kıızı.
- Belçika'lı gazeteci Marc Hoogsteyns, İran Kürdistanı ile ilgili diaporitiflerini Kürt halkı üzerine yaptığı bir konuşma ile gösterdi.
- Têkoşer folklor ekibi çeşitli oyunlar sergiledi.
- Genç Kürt ses sanatçısı Evîn devrimci ve aşk türküleri okudu.
- Kısa bir aradan sonra Hollanda-Arnhem'den gelen Koma Niştîman folklor ekibi çeşitli Kürt oyunlarını oynadı.
- Çocuklar gurubu Kürtçe parçalar okudu.
- Misafir sanatçı Brîndar çeşitli devrimci halk türkülerini okudu.
- Dışarda, değişik örgütler kitap sergilerini açmışlardı. Yemek ve içecek vardı.

3-5 NİSAN

Brüksel'de, Palais des Congrès de, "2e Assises Européennes Pour le Droit d'Asile" adında üç gün, "mülteciler" konusunda bir oturum düzenlendi. 20 Avrupa ülkesinden 300 kişi katılmıştı. Her gün bir kaç kişi çeşitli konuları konuşuyordu. Dinleyiciler soru sorup fikirlerini söyleyebiliyorlardı. Daha sonra çeşitli gruplara ayrılarak değişik konuları daha derin bir şekilde tartıştık. Konferansı hazırlayanlardan konuşmacılar veya dinleyiciler arasından konuşmacılar çeşitli seferler Kürt sorununu öne sürdüler ve tartıştılar. Salonun dışında Têkoşer, üç gün olmak üzere kitap sergisini açtı.

18-26 NISAN

Paris Kürt Enstitüsünü davetiyesi üzerine, Têkoşer'den bir arkadaş, Otonom Katalonya Cumhuriyetinin başkenti Barselona'da (İspanya), Kürt Dili üzerine 9 günlük bir seminere katıldı. (Sayfa 3 e bak).

1 MAYIS

Sosyalist İşçi Partisi'nin gecesinde kitap sergimizi açtık.

1 MAYIS

Belçika Emek Partisi'nin gecesine de kitap sergimizi açtık.

23 MAYIS

Çeşitli örgütler tarafından düzenlenen kültürel bir geceye katıldık. Gecenin amacı, "Petit Château" mülteci kampında bulunan ilticacılar ile dayanışma idi. Buradaki Mülteciler kötü şartlar altında bulunmaktadırlar ve bundan dolayı bir kaç kişi açlık grevi yaptılar.

25 MAYIS

Barış Üniversitesi tarafından, Journées Internationales ve diğer bazı örgütler tarafından, Brüksel'de Avrupa Parlamentosu'nda bir basın toplantısı yapıldı. Toplantının konuşmacı davetlisi, Arjantin'li 1980 Nobel ödülü sahibi Adolfo Perez Esquivel idi. Bu kişi tüm dünya'da insan ve halkların haklarını savunmak için dolaşır. Yaptığı konuşmada da "güney ve kuzey" in siyasi ve ekonomik, yani zengin ve fakir devletlerin, ilişkileri üzerine detaylı bir şekilde değindi. Têkoşer'den bir üye, faşist Türkiye rejiminin hususi yapısını ve Kürt halkı üzerindeki zulmü anlattı. Salon tıklım tıklım dolu idi.

AYDA BİR

- İnsan ve Halkların hakları Koordinasyonu toplantıları.
- Yabancı işçilerin belediye seçimlerinde seçme ve seçilme hakkı toplantıları.
- St.-Josse Belediyesi Kültürel örgütlerin toplantıları.

6 HEURES POUR LES REFUGIES



P.A.F.: 100 fr.

Non au projet GOL

23 mai à partir de 18h
'De Vaartkapoen' Rue de l'école 76 au Parvis St. Jean Baptist
1080 Molenbeek

Organisé par comité de soutien aux réfugiés
Amnesty International, AIDE, ADI, Belgienvereniging, Beweging Drien Brussel, CNMFD Centre International
International Centre, Comité de quartier Schaarbeek centre, Commission européenne d'immigration, Comité
d'entraide immigrés, C.O.R., Ecole St. Léon, Fédération de réfugiés, Institut de la paix, J.O.B.B. et
P.V., Ligue des droits de l'homme, La province de Brabant, Le service de l'immigration, M.O.C.I., P.T.C., P.T.E., Réseau
d'habitat, Réseau Alternatives, Réseau Art Libre, Service social itinérant, Solidarité avec les réfugiés, Têkoşer, Université
de la paix, de l'homme, U.P.B., Vrije universiteit, Vlaamse Guldenenakademie, WKAP, Via l'émigration, Service social
solidarité sociale.

